

Xema nexwe, rojên xweş nêzîk in.

## NAVEROK

Zilamek û zimanek  
Celadet Ali Bedirxan *Rûpel 12*

Çapemeniya Tirk  
û ya Kurd  
Ali Yiğit *Rûpel 3*

Rewşa cihanê û  
têkoşîna gelê Kurd  
Ahmed Cejn *Rûpel 4*

Îskencekirina  
zarokan li Tirkîyê ne  
nuh e  
Helsinki Watch *Rûpel 5*

Ez bi şev û roj  
guhdara welêt û  
girtîgehê me  
Xetice Altun *Rûpel 7*

Otonomîzm garantiya  
jiyana rejimên faşist e  
Selim Silioa Polis *Rûpel 10*

Dîroka nivîsandina  
destana Memê Alan  
Koyo Berz *Rûpel 11*

Jiyana Kurdan tê  
guhertin  
Ismail Göldas *Rûpel 16*

## Mitterrand hat û çû

Roja 14 ê Nîsanê serokê Komara Fransayê F. Mitterrand hate Tirkîyê. Ji bo hatina Mitterrand li Tirkîyê gelek amedekarî hatin kirin. Hikûmeta Demirel bi hêviyeke mezin li benda Mitterrand ma. Rojnameyê Tirkîyê bi rojan li ser vê hatinê rawestîyan. Ji lewre hatina Mitterrand ji bo Tirkîyê gelek giring bû. Mitterrand di demeke wisa de hat ku Tirkîye di nav tenhayîyeke mezin de bû.

*Rûpel 15*



Partiya gelê Kurd heye û di nav gel de sax daye

## 'Partiya nuh:' Hêviyeke vala

Tiştên nebûyî diqewimin. Pirr kes ji çav û guhêne xwe yeqin nakin. Hin mane behetî, zimanê wan nagere û hin jî dipirsin: Ci dibe, ci dibile.

Ka Kurd tune bûn, Tirkêne serê çiya bûn. Kesên ku heta doh înkara Kurdan dikirin, ji peyva Kurd vediciniqûn û hêrs dibûn iro mîna mirovîn bi tolerans û demokrat ban dîkin "entelektuelen Kurdan" û dibêjin: "Partiya Kurd çêkin".

Mesut Yılmaz û Erdal Înönü behsa partiyek Kurd dîkin: Partiyek Kurd divê, ev partî gerek çêbibe.

Ev pêşniyar wek pêşniyara Mesut Yılmaz û Erdal Înönü hate bihîstîn û belakirin. Belê di esasê xwe de ne ya du kesan yan jî serokên ANAP û SHP ye. Pêşneyar ya herşes partiyen siyasi û serokayetiya MGK ye û dewleten mîna Emerîka jî jê ne bêxeber in.

Partiyen meclîse li ser me-

sela Kurdan li hev kirine û partiyen siyasi de her kesî dît. Di demekê de ku partiyen siyasi ühikûmeta Demirel li sîna bismilehirehmanirehîm ordî dibêjin,

*Rûpel 15*

## Hovîti û durûtiya dewletê

- ERNK, belavokek belav kir. Di belavokê de li ser bûyerên ku di Newrozê de dîbin tê rawestin; kesên ku hatine kuştin navên wan yek bi yek têni diyar kirin. Ji van kesan hin bi gulleyan, hin jî di bin panzeran de têni kuştin. Yêni ku hatine kuştin tev sîvîl in, di nav wan de yek gerila nîne.

Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan (ERNK) Rêxistina Ewrûpa li ser bûyerên dawîyen li Kurdistanê, ji bo raya giştî belavokek belav kir. Di belavokê de li ser bûyerên ku di Newrozê de dîbin tê rawestin; kesên ku hatine kuştin navên wan yek bi yek têni diyar kirin. Ji van kesan hin bi gulleyan, hin jî di bin panzeran de têni kuştin. Yêni ku hatine kuştin tev sîvîl in, di nav wan de yek gerila nîne.

Di belavokê de wiha tê gotin: "Gerila di pêvajoka serî-

rastiyê diyar dikin"

hildanên Newrozê de, bi tu awayî êris nebirin ser hêzên dewletê û di şâhiyên Newrozê de cih negirtin. Raporê ku hatine amade kirin jî, vê

Hêzên dewletê li gundan bi bahana lêgerina çekan dikevin nav malan eşya û zadêngundiyan tevlîhev dîkin ku êdî kérî tu tişîfî neyên.

*Rûpel 15*

## Serê germ

- Bi destpêka biharê re gerila jî êrisen xwe zêdetir kirin. Gerilayê ARGK ê, li Kurdistanê di hefteya dawî de deh êris pêkanîn. Şer roj bi roj germ dibe
- Ordiya Tirk bi balafirên xwe ve êris birin ser qampêng gerila yên li Kurdistanâ Başûr. Di van êrisan de balafirên Tirk, çiyayê Kurdistanê bombe kirin

*Rûpel 3*

## ROJEVA WELÊT

### Dewlet desten xwe dipelîne

Neroza û lehengîya şeniyê Şîrnex û Cizîrê û berxwedana welatiyê me li her derê, ambalaj û perdeya şef-qata dewletê rakir. Xwînrejiya militârîzmê, bi tank û bi topan ajotina ser komelanen xelkê bê çek, xerakirin û talankirina mal û di kanen xelkê giş.

*Rûpel 15*

# REWS

Abdullah Keskin



## Enstituya Kurdi

**E**m her dem dibêjin û dîsa dibêjin: İro welatê me, gelê me demeke nuh dijî. Ev dema nuh dezgah û avahiyên xwe yên nuh derdice. Dezgah û avahiyên neteweyî roj bi roj zêde dîbin. Enstituya Kurdi jî yek ji van dezgahêne (muessesêne) nuh e. Roja ku ev hejmara me bikeve destê we (18 è Nîsanê) li Istenbolê Enstituya Kurdi vedi-be. Piroz be li me tevan... Em bawer dîkin ku Enstituya Kurdi wê di pêşveçûna çanda neteweyî de rîstekî (rolekî) girîng bileyize.

Pirsgirêkîn welatê me pirr zêde ne. Bi xebata du-sê kesan ev pirsgirêk hal nabin. Xebatê zanyari (ilmî) û organîzasyonêne mezîn pewist in. Xwirtkirina van dezgahêne neteweyî em wek wezifeyekê ji xwe re dîbin. Ji bo alîkariyê em amade ne.

Metingeran (kolonyalîstan) welatê me, dîroka me, jiyan û heta bi mejiyên me be-

lavkiribûn. Lî iro em qedera xwe digirine destê xwe. Hêviya çareserkirina van pîrsan di vê rastiyê de ye. Rêya jiyanekî nuh xwiya dike, em dikevine ser vê rîyê hêdî hêdî... Em bawer dîkin ku rojekê emê wan perçeyen ji hev belavkirine bînin ba hev. Wê çaxê wê xewa me xwestir, jiyanekî nuh rûmettir û serê me bilindir bibe.

Civaka Kurdan civakeke kevneşop e, tra-disyonel e. Li alîkî teknoloji, li alîyê din asî-

*iro em qedera xwe digirine destê xwe. Rêya jiyanekî nuh xwiya dike, em dikevine ser vê rîyê hêdî hêdî...*

*Em bawer dîkin ku rojekê emê wan perçeyen ji hev belavkirine bînin ba hev. Wê çaxê wê xewa me xwestir, jiyanekî nuh rûmettir û serê me bilindir bibe*

mîlasyon. Berhemêne çanda (kultura) Kurdan winda dîbin. Girîngîya xebata Enstituya Kurdi di vê derê de xwiya dike. Hê jî rastnîvis û rîzimanekî zimanê kurdi ya bi rîk û pêk tuneye. Lékolîngerên li ser Ferhengen dixebeitin behsa 60-70 hezar peyvîn Kurdi

dîkin.

Lî ferhengen di destê me de gelekî qels in. Xwendevanen me gelek caran ferhengen kurdî ji me dixwazin. Em naxwazin ferhengen di piyasê de ji wan re salox bîdin, ji ber ku xeletî di navê wan de pirr in û ne li gora metodeke ilmî hatine amadekirin.

Gelek peyvîn di nav xelkê de têne ji bîr kirin, kêm têne bikaranin. Daxwaza me ew e ku enstitu berî her tiştî van peyvan li hev kom bike û pîrsîrêkîn zimên hal bike. Ferheng û rîzimanekî enstituyê divê ne lokal be. Divê Kurdîn Başûr, Bakûr û yên li de-veren din jî dijîn tev jê fîm bikin.

Em serkevînê ji Enstituya Kurdi re dixwazin û li bendî berhemêne nuh in.

### Xwendevanen hêja,

Cihê me yê xebatê, buroya Welat hate guhertin. Numerên fax û telefonên jî hatin guhertin. Ji vir û pê de ji bo rojnameyeke baştir, li cihekî firehtir emê xebata xwe berdewam bikin.

Navnîşana me ya nuh di rûpela 16 an ya vê hejmara Welat de heye. Her wiha numerên telefon û faxê jî hûn dikarin di rûpela vê hejmara me de bibînin.

## Rewşenbîrêne me, ziman û zanebûn

"Du derdêne me hene: Yek xezanî û yek jî nezanî ye". Ev gotin yê seydayê Cegerxwîn in.

Belê nezanî derdê me ye, neyareki bê mirwet û bê wîjdan e. Cihê dikêvîyê hişk dike, têhn û rewayê tê de nahêle.

Dermanê nezaniyê zanebûn e. Kilît û deriyê zanebûnê jî ziman e, zimanê zikmakî û xwendin û nivîsandin e.

Rewşenbîrêne Kurd di kovar û rojnameyê kevin û dema nuh de jî, ji sed salî û vir de, di rojnameyê mîna Kurdistan û Jin de li ser malkambaxiya nezaniyê û hewcedariya zimanê zikmakî ji bo rakirina nezaniyê sekînîne. Mesela ev beytên A. Rehîm Zapsû pirr belavbûne: "Hey nezaniyê / hey giđi xayinê / zilma te ye ya ku em bê huner û bê dîn hiştine / xezeba te ye ya ku welatê min wêran kiriye û kîna te ye ya ku bedena min hişk kiriye".

Rewşenbîrêne Kurdîzade Kemal Beg jî daxwaza rojê di hevokeke kurt, lê têr û bi mane de dihundirîne "Hêviya me ew e ku em xortan bicivînîn û cehaletê derxînîn ji Kurdistanê".

Alahîlgirê zanebûnê û dijminê nezaniyê Şefik Arvasî jî di vî babeti de xwedi gotin e: "Nezanîn û cehaletê pirr xerab e. Madem wiha ye gerek em berê xwe bidin zanebûnê. Riya zanebûnê jî xwendin û nivîsandin e. Ew jî bi zimanê zikmakî di-be. Lewra heta mirov zimanekî din hîn bibe emrek di-ce." KTC İsmail Göldas 88

Di ser van gotinê zanayen me re zêdeyi 60 salî derbas dibe, lê iro jî tiştîn gotine aktûl in.

## FERHENGOK

### Navêne mehan

Çile: Ocak

Sibat: Şubat

Adar: Mart

Nisan: Nisan

Gulan: Mayıs

Heziran: Haziran

Tirmeh: Temmuz

Tebax: Ağustos

İlon: Eylül

Cotmeh: Ekim

Mijdar: Kasım

Kanûn: Aralîk

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Kurdhayetî û serkeftin

Ez pêşî Rojnameya Welat li gelê Kurdistanê pîroz dikim.

Bi bîr û baweriya lêkolîvanan dîrokzanan, gelê Kurdistan bi kîmasî 5 hezar sal in li ser xaka ku fro gelê Kurd lê dijî, jiyanekî nuh didomîne. Gelê Kurdistan di vê pêvajoya 5 hezar salan de, ji bo şarezayiya mirovahiyê gelek berhemêne giranbuha afirandin û van berheman di pêşveçûna mirovahiyê de bingehêk mezin girtiye.

Lewma Mezra Botan di dîrokê de mîna dergûşa şarezayiyê tê naskirin. Lî çi mixabine ku gava mirov li dîroka gelê Kurdistan ya hemdemî dinêre, dibîne ku gelê Kurdistan ji van berhemêne giranbuha bê par maye.

Dagirkeran welatê me xistine bin nîrxên xwe, dîroka me berevajî kirine. Em ji neteweya xwe, ji zimanê xwe, ji çanda xwe û ji gîhana Kurdayetîyê dûr ketine û di şexsê me de hebûna dagirker pêkhatîye.

Em dizanîn ev bi rehetî

pêknehatine, gelê me gelek li berxwe daye, gelek xwîn rijandîye, lî serkeftin nehatîye holê.

Sedemîn bi serneketina serhilî dan û berxwedanen gelê Kurdistan, mirov kare bi sê xalan bîne ziman.

1- Tunebûna yekîtiya neteweyî.  
2- Tunebûna serokatiyek hemdemî.

3- Hebûna welatfiroşan, ku di dîroka gelê me de rolek taybetî lîstine.

Ev rewş li Kurdistana Bakûr heya salên 1970 an berdewam kir. Ji wan salên 70 yan vir de li Kurdistanê pêvajoyek nuh dest pêkir.

İro welatê me bi xwîna keç û xorten dilsoz ber bi rîzgariyê ve dije. Wan keç û xorten leheng, ewrên reş yên ku hezar sal in ser welatê me girtibû, ji hev belavkirin û ji şuna ewrên reş, tîrîjîn tavê xwe berdan ser welatê me Kurdistan.

Kerîm Botan

## Rengê Xwîna Şehîdan

Mizgîn li we rojnameya bi navê "Welat" derket

Ji mêjde li benda tene ser seran, ser çavan tu hat Kesên welatparêz bengiyê nav û dengê te ne Kûr dinalin tim dibêjin ax Welat ax Welat

Rohniya çavanî, rojnameya cerg û dilanî Welat Taca ser î, gula zer î xwîna keser î Welat Gumana ciwana, mirazê kal û pîranî Welat Melhema birîna dermanê jan û kul û derdanî Welat

Rengê xwîna şehîdan, hibrâ navê te yê sor Tipen teyên reş belek rîzên teyên xemî delal Peyvîn teyên zelal, zarê teyê pirr şîrîn Mest û şen kirin dost û yar û hogir û heval

Jiyan bite xweş bû, xebat bite ges bû Di kesk û sor û zer werbûn çiya û deşt û newal Em hêvî ne li dû te damezrit aşî wekhevîti Da pîroz bikin, demokrasî, azadî her gav û her sal

Her bijîn kesen te nivîsandin bi zarê me yê kurdî Rewşenbîrêne hêja û zana mirovîn û dilovan Bila bişkîn desten di nav me reşandin tovî dijmîntî Dest li ser me hejandin em hiştin bê maf û bê ziman

İro findika rojnameya Welat di cilwilî Stêrka bext teyîsî ji tarîti dê bibûrîn bê guman Spas û rûmet bo we dişînîn bi baran ji dil û can Serkeftin û pêşketin bo we dixwazin her caran Çekdar Pale / Tetwan

## Ji me re yekbûn

### û tifaq lazim e

Ji bo kovara we derxist ez têm çavên we. Jîna we, serfirazî û azadiya we daxwaza min e.

Gava min Rojnameya Welat dît ji şahîyan re êstir ji çavên min fi-rîn. Mirovî nikaribe bi zimanê xwe xebet bide ew ji heywanan jî kêmtrî e. Çunkû heywan di radyo û televizyonan de xebet didin. Lî em Kurd zimanê me hatiye birrîn. Em mirov nayen hesabê. Gerek em neyên xapandin. Li dijminan tu carî ewle nebin. Her bijî rojnameya Welat.

Ji me re yekbûn û tifaq lazim e. Bes e kolefi bes e bindestî. Bijî azadî. Bijî serbestî, bimre nezanî, bijî xwendan.

Hafit Keskin / Van

## Daxwazên me...

Ez xortekî 18 salî me, dema ku rojnameya Welat derket ez pir kîfxwes bûm û kîfa min hat, ji hejmara diduwa û virde min kîrrî û xwend. Ev ji gelê me re tiştîkî rind e, ev cend sal in ku em bi hesret in ji zimanê xwe re. Kes tunebû ji derdê me mijul bibe, kes tunebû ku ramana me bîne ziman, kes tunebû ku birîna me bipêce. Lî iro va yek heye, ne yek e; hinek in. Ha bi kurdî, ha jî bi tirkî ne.

Edî ez xwestina xwe bînim ziman, rojnameya min hûn jî zanîn ku rojnameyên dewlemendan, her çawa bin ji hinek jî di heqê dîn de, anku eliminandinê de dinivîsin û çap dîkin. Ez hevîdar im ji we di heqê eliminandin û xwendina dînê me yê İslâmî de hûn binivîsin û çap bikin. Ez dîsa hevîdar im ku hûnê vê xwestina min bi cih bînîn.

Gelek spas dikim ji ber ku nivîsandina we ya paqîj rast û hêja. Ez bawer im hûnê her dem serfiraz bin. Newroz'a we hemûyan pîroz be.

Tu her hebe, her bijî rojnameya "Welat".

Ramazan Münevver

## KARTA ABONETİYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :

Paşnav :

Navnîşan :

### Bedelê abonetiyê razînîn:

Li Tirkîyê: Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu  
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu  
Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

### Aboneyê hejâ,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnîşana WELAT Başmusahip Sok. Talas Han No: 16 kat: 3, No: 301 Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel-Fax: 512 12 87

### Mercen abonetiyê:

Li hundir	60.000
6 meh	120.000
Li derive	30 DM
12 meh	60 DM

Li hundir	60.000
Li derive	30 DM
12 meh	60 DM

Êrîşen gerila zêde dabin

# Serê germ

Êrîşen gerilayêñ Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan berdewam e. Bi destpêka biharê re gerila jî êrîşen xwe zêdetir kirin. Gerilayêñ ARGK ê, li herêmê di hefteya dawî de deh êrîş pêkanîn. Şer roj bi roj germ dibe

Roja 8 ê Nîsanê, li nêzîkî Serêpirê saet di 21.80 an de gerilayen kemînek (pusu) li pêsiya panzereke endamên hêzên taybetî (Özel tîm) dânn. Di kêmînê de 4 özel tîm hatin kuştin.

Di 10 ê Nîsanê nîvê şevê saet 23.15 an de, gerila çar medorê ïdilê girt û bi çekêñ giran êrîş birin ser dezgehêñ fermî (resmî) yên dewletê. Gerila, qereqol û avahiyêñ dewletê bi çekêñ giran 8 saet kutan di navbera gerila û leşkerêñ Tirk de şerekî dirêj destpêkir. Li gor agahdarîyêñ gihîstine destê me, geleñ leşkerêñ Tirk hatin kuştin û birîndar kirin. Windayêñ gerila qet nînin.

Dîsa di 10 ê Nîsanê de gerila, êrîş bire ser qereqolêñ polîsan û avahiyêñ leşkeran ên li Nisêbînê. Polîs û leşker 5 saet di bin agirê gerilayen



de man. Du panzerên polîs hatin tehrîp kirin. Ji polîs û leşkeran jî gelek kes birîndar bûn. Dîsa gerilayêñ ARGK ê di 10 ê Nîsanê de, êrîş birin ser Silopî û Besnî. Le van bajarokan hindiktrîn 4 leşker û polîs hatin kuştin.

Di roja 11 ê Nîsanê geril-

layan 2 endamên kontrgerilla, li navenda Nisêbînê bi mirinê ceza kirin. Navê sixurek ji wan Yusuf Zengîn e.

Di roja 13 ê Nîsanê de qerdiyanê zîndanê M. Şerif Erdem û serokê cerdevanê (çeteyêñ) gundê Tinatê Muhibbîn Sayhan ji hêla gerillaryan ve hatin kuştin. Roja 14 ê Nîsanê gerillaryan gitin ser qereqoleke leşkerî ya li Şîrnexê û 10 leşker kuştin. Livbazî (eylem) di saet 22.10 ê şevê de pêkhat.

Dîsa roja 14 ê Nîsanê li navçeya Palu (girêdayî Mazrayê ye) di navbera hêzên dewletê û gerillaryan de pozberiyek (çatışma) derket. Di vê pozberiyê de 4 leşker hatin kuştin û leş-

Ordiya Tirk bi balafirêñ xwe ve êrîş birin ser qampêñ gerila yên li Kurdistan Başûr. Di van êrîşan de balafirêñ Tirk, çiyayêñ welêt bombe dikir, gerila jî di 15 ê Nîsanê de êrîşke mezin bire ser Şîrnexê, teymenek û 7 leşkerêñ Tirk kuşt. Gerila di hem rojî de li Palo êrîşek bire ser qereqoleke leşkerî û du leşker kuştin. Li Sîrtê di navbera gerila û leşkeran de şer derket, 3 leşkerêñ TC.ê hatin kuştin. Di 15 ê Nîsanê de grubek ji gerila, êrîş bire ser qeroqoleke leşkerî yên li gundê Başmaklı (Bedlîs) du leşker kuştin û çend leşker jî birîndar kirin.

Gerilayêñ ARGK êvara 12 ê Nîsanê, di saet 22.30 an de, dîsa êrîş birin ser navenda Silopiyê. Polîs û leşkerêñ Tirk 5 saetan di bin agirê gerilayen de man. Di hem rojê de gerila êrîşek jî bire ser qereqola Kerboranê û du leşkerêñ Tirk kuştin.

ker jî bi xederî birîndar bûn.

Waliyê herêma taybetî Ünal Erkan, di agahdariyê xwe de, her tim dibêje ku

## KONEVANIYA NUH

Ali Yigit



### Çapemeniya Tirk û ya Kurd

Çend kovar û rojnameyên biçük û demokrat ne tê de, ji bo giş çapemenî û rojnamegeriya Tirk ev dikare bê gotin: Kovar û rojnameyên hene xerab in. Ne objektif in, li dijê xelkê û li aliyê dewletê ne û ji pelên ewil heta bi yê dawî bi şovenîzmê û dijmînayetiya nav gelan dagirtî ne.

Bê qedar û bê qam derewan dikan. Nîrê xwe li nerastî û mizawiriyê girêdane û derhemâ cidiyet û mesûliyeta pîseyî li ba wantu. Ez hinekî jî ji tecrûbeya xwe ya şexsî û ji awayê çêkirin û belakirina xeber û nûçeyên wan jî bûme xwediyê vê qeneetê.

Heşkere û li ber çavan e bê ev çapemenî ji kê re kar dike û di xizmeta gel û rastiyê de be, divê raya gişî û şeniyên welatekî rohîndar û hayîdar bike. Berê wan bide ya rast û di wextê xwe de wan serwext û hişyar bike, hest û ruhê demokratîk, mirovhez û şewqedar di nava xelkê de biçîne, tov û bizrê başiyê, wekheviyê, heqî û edaletê xwirt û geş bike.

Rojnamegerî û rojnamevanî karekî hêja û bi nîrx e. Gerek di xizmeta gel û rastiyê de be, divê raya gişî û şeniyên welatekî rohîndar û hayîdar bike. Berê wan bide ya rast û di wextê xwe de wan serwext û hişyar bike, hest û ruhê demokratîk, mirovhez û şewqedar di nava xelkê de biçîne, tov û bizrê başiyê, wekheviyê, heqî û edaletê xwirt û geş bike.

Rojnamegeriya Tirk tersê vê dike, bermeqûb e, tije jînê tazî,

menzereyên pornografîk û reklamên malê dewlemdan in. Dijmînayetiya gelê Kurd, mebûs û partiyên Kurd dike, gelên Kurd û Tirk li hev sor dike û ji bo ku wan bikin neyarêñ hev ci ji destê wan tê texsîr nakin.

Ji ber van sebebán e ku rojnamegerî û rojnamevaniya Tirk roj bi roj bê itîbar dibe û gel bi taybetî li welatê me nema baweriye pê tîne. Ev zêdeyî 3 mehan e ku li Nisêbînê û gelek bajarêñ din yên welêt kes nema rojnameyên hene dixwîne, kes nakire û hatine boykot kirin. Helwestê xelkê di cihê xwe de ye. Xelk di nav zîlm û zordariyê de çavêñ xwe vedike û digre, her roj bi sedan neheqî û çavşorî ji aliyê hêzên dewletê û bi navê dewletê têne kirin, belê rojname qet behsa wan nakin û çav û guhêñ xwe digrin.

Em iro bi kêt û dilxweşîyeke mezin derketin û zêdebûna rojname û kovarêñ objektif û kurdi taqîb dike. Derketina welat, berî welat heger ne bi kurdi jî be belê ji ber objektifbûna xwe Yeni Ülke me bextewer dike. Şikestina monopol û semyantiya rojnamegeriya paşverû û li dijê Kurdan, rojnamegeriya virrek û sextekar gavek pesindar û hêja ye.

Em giş gerek li çapemeniya xwe li rojnameya Welat, kovara Rewşenê û Tewlo xwedî derkevin, wan bixwînîn û bidin xwendin.

Dema gerilayêñ ARGK ê "leşkerêñ me... hewqas terorîst kuştin, birîndar kirin û hwd." Rojnameyên Tirk jî van nûçeyên nerast dinivisîn û belav dike. Dewlet û çapemeniya Tirk rastiyê ji gel vedişerin. Lî veşartina rastian bê imkan e.

Di 13 ê Nîsanê de li navçeya Palo gundê Havil û Nacalan di navbera grubek gerila (10 gerila) û leşkerêñ Tirk de şerek çebû. 6 hezar leşker û 2 helikopter tevî vî şerî bûn. Şer 2 roj û du şev dewam kir. Di vî şerî de 6 parêzgerên gund û 8 leşkerêñ Tirk hatin kuştin. Gerila tu zeiyetekî neda, hilkişîya û winda bû.

Li Dêrsimê dîsa di hem rojê de gerila êrîş bire ser leşkerêñ Tirk, Di navbera leşker û gerila de şer rojek domkir. Derheqê kuştî û birîndaran hîna tu agahdarî nehatiye sitendin.



# Rewşa cîhanê û têkoşîna gelê Kurd

Ahmed Cejn

Li hemû cihanê serpêhatiyên mezin têne jiyanin. Bahoz aza-diyê li hemû deveran kela dagîrkeran sar dike, bendê çögên da-gîrkeriyê sist dibin û ev jî domaneke nuh bi xwe re dihêne. Gelek ji gel û neteweyan fersend û delfveya rizgariyê bides dixin, hewl didin xwe ku xewnêñ xwe bikin rastiya jiyanê.

Di vê domana nuh de dagîrker (îsgalker) û imperialist di nava dubendiyên kûr de ne. Bi wate-yeke din were gotin, pêşveçûn û pêşketinêñ ku têne jiyanin Împerialistan neçare dikan, pirs û pirsigirêk bê çareserkirin dimînin. Helbet dagîrker çareserkirineke li gor xwe dixwazin. Lî belê gelên ku dixwazin mafen xwe bistinîn li hemberê "çareserkirinê" da-gîrker û Împerialistan radiwestin û îradeya xwe didine jiyanin. Gelê Kurdistanê di wê dema gi-ring de bi roleke mezin radibe.

"Saziya Cihanê ya Nuh" (Yeni Dünya Düzeni) li Rojhilata Navîn bi serneket û naakeve jî. Asteng û diwarê mezintir şoreşa Kurdistanê ye. Şoreşa Kurdistanê an jî em bêjîn pêşveçûnê li Kur-distanê hesabêñ hêzên dagîrker serûbin dikan. Dagîrker di kesaniya dewleta Tirk de ber bi mi-rinê ve dicin.

Piştî qirkirina ku hêzên dewletê di şadimaniya Newrozê de pêkanîn, rastiyek din jî derkete holê: Ëdi gelek hêz û dewlet he-sabêñ xwe li gor pêşveçûnê li Kurdistanê dikan, li gor pêş-kestinan dubendi û problemen di navbera xwe de derdixine pêş an jî sergirtî dikan. Gelek dewletê Ewrûpi ji bo fêdeyên xwe yên aborî û bazirganî (ekonomik ve ticari) kîrinên dewleta Tirk mîna navgîna şantajê bikartînîn. Pro-testoyen ku di vê dema dawiyê de pêşve hatin divê di çarçiveye-ke wiha de werin şirove kîrin.

Ji bo ku rewşa cihanê, duben-diyyen di nava hêzên xwedî gotin de û hikariya(tesîra) raperînen gelê Kurd li rojeva polîtikayê navneteweyî(internasyonal) ci ye

were fêmkirin, divê em hinekî li daxwazêñ dewletê İmperialist jî binerîn û hewl bidin xwe ku çend encaman (sonuç) jê derêxin. Dubendiyên di navbera Almanya û DYA (Dewletê Yekbûyi yê Amerika) de hîkariya xwe li dewletê dûvîkîn wan jî dikan. Her wiha li aliye din Japanê çavjûjîni jî bi lez û bez di rojeva polîtikayê bazirganî de ji xwe re cihékî qewîn distûnîn.

Di çarçiveyeke fireh de rews wiha ye. Bi giranî ji pişti yekbûna Elmanaya rojhîlat û rojava coga têkiliyan bi vî rengî diyar bû û xwi-ya ye wê demekê beza di navbera van hêzan de ber-dewam bike. Berî hei tişti, her yek ji van hêzan xwediyê hinek armanc in û yek armancen xwe bi erzanî naxwaze ji destê xwe berde. Ci ne ev ar-manc?

Bi taybetî pişti têkçûna sosyalîzma reel li Ewrûpâye, valahiyek peydâ bû. DYA û NATO ëdî mîna berê nikarin parêzvaniya hemû dîn-yayê bikin. NATO dice saziyeke bê fonksiyon û lingêñ wê ne li ser erdê. Fransa li aliye kî dixwaze pêşengîya Ewrûpâye bigire û Almanya li aliye kî. DYA jî dixwaze rola xwe demeke din jî bidomîne. Lî belê daxwaza Emerîka, ji ber gelek sedeman ni-kare were cih. Emerîka ji aliye cografîki ve nikare bi hêsanî bigîhîye Ewrûpâye û gelek welatê Ewrûpi jî naxwazin destûr bidin; ji ber ku dizanîn wê li serê wan bibe belayek. Di nava wan welatan de Yunanîstan jî heye. Helbet derdê Yunanîstanê jî tiştekî din e. Emerîka astenga he-rî mezîn li pêşberê Yunanîstanê di mesela çareserkirina pîr-sigirêkînî de derwleta Tirk re. Anku Amerîka bi riya Tirkîye û di ser Tirkîye re dixwaze bigîhîye komarêñ Tirkî yê Asyayê.

Fransa jî gelekî ji Emerîkayê

hez naake. Polîtikayê xwe mîna saziyeke girêdayî Emerîka dime-şîne lê belê di mesela têkiliyan bi welatê Ewrûpaya Rojhîlat re ava wan zêde bi ser hev de na-meşe. Lî hema hêza Fransa di ber ya Almanya de ne tiştek e. Ji lewre Fransa jî dimîne li aliye kî. Li Ewrûpa di rewşa iro de hêza herî xwirt Almanya ye û Elman-ya jî dixwaze vê fersendê baş bi-kar bîne. Her wiha Japonya jî bi Elmanya ya yekbûyi re di warê têkiliyan bazirganî de gelek du-

## KURDISH LIFE

■ Number Two  
Winter 1992

A publication of the Kurdish Library, 245 Park Place, Brooklyn, New York 11238 telephone: 718-783-7530 Fax 718-266-4386

### The World's First Kurdish Museum

We are delighted to announce that a Charter has just been granted to the Kurdish Museum by the Board of Regents of the State of New York. Gifts & paintings and other works of art, costumes, rugs and artifacts donated to commemorate a historical event, to honor a loved one or special friend will serve as a lasting tribute.

### Results of the first Kurdish Opinion Survey

*Latin Fall: The Center for Research on Kurdish Life conducted a pilot study of Kurdish opinions. Results were summarized and presented at the 1991 Annual Conference in Washington, DC. At the Association's Annual Conference in Washington, DC in November, since the MESA presentation, new returns arrived from Scotland, the Soviet Union, Iraq and Turkey. They will be factored into the final tally that will appear in the full text of the study to be published in the forthcoming issue of Kurdish Times. Here is the summary presented to the MESA conference.*

### Why the Survey?

*American assumptions about Kurdish aspirations in the Middle East are based largely on statements in the press and media. For example, the Wall Street Journal recently had this to say about Kurds in Turkey: "It is generally agreed that most don't want independence, they prefer better treatment within Turkey." (December 1991). In contrast, the Carter Center, who has done much work in telling the Kurdish people in Turkey what they would be happy with autonomy, reiterated this claim once more in a recent essay: "They want only autonomy, not the independence the Turks dread." (January 22, 1992) Fearing loss of support and sympathetic though they have experienced little of it, Kurds have learned to tell Westerners more what they want to hear than what Kurds want. Americans are thus led to believe that the general impression that the Kurds of the Middle East will be satisfied with autonomy within the borders of existing countries that only a minority of Kurds in Turkey are demanding. Some reports have come to us so far as to suggest that the Kurds could be placated with cultural rights alone. But how valid are these assumptions?*

*Statistical and divided, the Kurdish people find themselves in a precarious position in terms of affirming the directions of their Kurdish names. Yet it is these hopes, their fears and their attitudes*

*that will ultimately determine the efficacy of policies developed in their name. This pilot study was a first attempt to give them the opportunity to speak for themselves.*

*320 questionnaires were mailed in the United States and abroad. 44% were completed and returned in envelopes provided by the Center for Research. Within the U.S. returns were postmarked from Florida, California, Kentucky, Michigan, Tennessee, New York, New Jersey, Virginia, Washington, DC, Wisconsin, Massachusetts, Maryland and North Dakota. Overseas returns came from Canada, Sweden, England, France, Belgium, Austria, Germany, Switzerland, the Netherlands, Australia and South Africa.*

*Respondents were instructed to answer anonymously and independently of their country of origin from a list that included Turkey, Iraq, Iran, Syria, and the Soviet Union. A space marked "other" was also provided in which five respondents wrote in "Kurdistan".*

*31% of the responses came from Kurds originating in Turkey, 57% Iraq, 5% Syria, 4% Iran, 3% Kurdish. Data was corrected by country and then totalled over.*

### Opinions on Recent Events

*Differences of opinion were most striking between Kurds from Turkey and Iraq. In responses related to recent events, there was clearly the case. For example, when asked "Do you approve of negotiations between the Iraqi Kurdish Front and Saddam Hussein?" a combined total of 50% answered Yes, 44% No, 6% Undecided. In contrast, 70% of Kurds from Turkey said No. Within 70% of the Iraqi Kurds, 53% of those from the south and 79% of Kurds from Turkey opposed this. Respondents from Iran and Kurdistan also expressed disapproval. Only Syrian Kurds agreed with the Iraqi Kurds.*

*Another example of the marked divergence of opinion between Kurds from Iraq and Turkey. Respondents were asked if they approved of meetings between the Iraqi Kurdish Front and President Oval of Turkey. A combined total of 55% answered Yes. This total represents the approval of 75% of Kurds from Iraq. On the other hand, 85% of the Kurds from Turkey opposed these meetings.*

*Differences between these two groups was again apparent on the question of whether they are against Iraq because of the Kurds. A combined total of 59% were in favour of the Kurds. But this percentage was raised substantially to 85% of those from the Iraqi Kurds. 72% of Kurds from Turkey did not feel that the Gulf war benefitted the Kurds. Kurds from Syria and Iran share the sentiments of the Iraqi Kurds.*

### "Jiyana Kurdan", bultena saziyeke Amerîka bi navê Kurdish Library "Pirtûkxaneya Kurdan"

Stated and divided, the Kurdish people find themselves in a precarious position in terms of affirming the directions of their Kurdish names. Yet it is these hopes, their fears and their attitudes

şanî me dide ku ji bo fêdeyên xwe dewletê İmperialist goşte hev jî dixwin. Rewşa ku iroj derikeve pêşberê me jî ev e.

Elmanya ji bo ku pêşiyê li Emerîka bigire û nehêle bikeve dewletê Tirkî yê Asyayê, dostê xwe yê sed û pêncî sali (Dewleta Tirk) protesto dike. Helbet di vê protestokirinê de tesîra serhil-danê gelê Kurd heye. Lî belê divê em baş bizinan ku dewleta Alman ci carê nebûye dostê gelê Kurd û iroj jî ne dostê me ye. Ev

ye kî jo bo Avusturya, Da-nîmarka, Ingîlîstan... û Norveçê jî derbas dibe. Ev dewlet jî ne dostê me ne. Baweriya me, ew kes û hêzîn ku rastiye nabêjin û xwe diavêjin paş tûman ci caran nikarin bibin dostê me. Amerîka bi

xwe jî rastiye dizane û dibîne. Di raporê CIA'yê de rewşa gelê Kurd bi de-tayl derbas dibe. Ji bo nimûne saziyeke Emerîki ya bi navê "Kurdish Library" li hemû Kurdistanê û di nava hemû Kurdên ku li Ewrûpa dijin de ista-tistikê çêkiriye û encama (sonuç) vê xebata xwe di bulteneke bi navê "Kurdish Life" (jiyana Kurdan) hejmara duyemîn de weşandiye. Di vê istatistikê de gelek pirs hatine kirin û pir ecêb e ku ev encam bê sansur hatine pêşkeshirin.

Li gor vê istatistikê gelê Kurd yê ku li Kurdistanâ Bakûr û basûrê rojava (perçeyê Suriyê) dijî, ji sedî 87 Abdullah Öcalan ji xwe re serok dibînîn û amade ne di bin rîberiya Ocalan de têbikoşin. Li hember vê ji sedî 2 (du prosent) Kurdên bakûr Talabanî û Barzanî serokê Kurd dibînin. Piştîgiriya Kemal Burkay tenê di nav Kurdên ji Kurdistanâ bakûrên li Ewrûpa û çend ba-jarîn Tirkîye heye û ji sedî 4 (çar prosent) e.

Dîsan di nava hemû Kurdan de Öcalan serokê gelê Kurdis-gerêkîn, di re biye kî engîlîstanî û têkiliyan bi dewletên din re ji cih li serî teng bûye. Ëdi bekewletek jî bi diplomasia wan bawer nake. Bi dehan dewleten dengê xwe bilind nekiribin ji ne-rihetiya xwe anîn zimên. Niha ji Mitterand hatiye û hejmarek hevditinan çêdike. Em binêrin Mitterand, dewleta Tirk û Enstituya Kurd li Parîs ci li hev dikan. Bila bimbarekî hev bin.

Bi ihtîmaleke mezin Özal û Demirel dixwazin bi piştîgiri û destegiriya Mitterand partîyeke Kurd ava bikin. Ji xwe berî ku Mitterand were heta Mesut Yilmaz hemû serokê partîyen siyasi yê di parlamento de ev mina-geşê û gotûbêj kîrin. Amerîka û Elmanya ji dikarin piştîgiriya partîyeke Kurd a di bin kontrola dewletê de bikin. Ma Elmanya ne digot "em piştîgiri gelê Kurd in. Lî belê PKK terorist e".

Dewlet ji dil dixwaze bi xwe-firoşan partîyekê bide saz kîrin. Em di serî de dikarin bibêjin ku partîyeke wiha nikare piştîgiriya gel bistîn. Ji ber ku gelê Kurd yê welatparêz ëdî dixwaze sa-ziyen xwe yên neteweyî bixwe ava bike û dike jî. Bo nimûne roja 18'ê Nisanê Enstituya Kurd vedibe. Him serokê vê enstituyê jî dostê gelê Kurd û hemû gelên bindest Mamoste Beşîkçi ye. Her wiha hemû rewşenbîren Kurd yên bi rûmet jî tê de cihê xwe distînîn. Ew partîya ku bi destê kesen bêrûmet û xwe-firoş were sazkirin bêguman me navê.

Li çar aliye cihanê gel ji bo serxwebûn û azadiya xwe ser di-kin. Em serkevînê ji bo hemû gelên ku têdikoşin û gelê Kurdistanê dixwazin.

Mizginek din jî ji bo gelê Kurd: Tenê de meha Adarê de gerillayê serxwebûnê 184 livba-zî (eylem) pêkanîne. Pîroz be.

tanê tête dîtin û ji gel piştîgiriye ke mezin distîne.

Tevli ku ev rewş li ber çavan e û di istatistikâne de cih digre Elmanya û çend dewleten din hîn jî dibêjin "Tirkîye li hember terorê şer dike. Ev mafê Tirkîye ye. Lî belê bila ziyan negîhîje sivilan" Baş e em dipirsin serokê rîexistineke ku ji sedî 87'ê dengen gel distîne terorist e, an jî partîyek ku nikare ji sedî 30 dengen bistîne? Li vir tiştekî din jî derdi-keve: Dewleta Tirk û hemû dewleten hevdîben wê bi hev re terorist in!.. Gelek caran hînek rewşenbîren me digotin dewlet terorist e, lî belê ev dîtin nikarîbû were ispatkirin. Baş e ha ji we re ispat. Mîna ku di nava gelê me de dibêjin: Ha ji we re senet û ha ji we re sepet".

De bigirin sepete bi serê tero-ristan de kin.

Înönü kurê Înönü çû li çend dewleten Ewrûpa geriya; hejmarek hevdîtin çêkîrin û paşve zivîrî. Piştî ku hat jî, ji rojnamevanan re got "gelek baş bû, hemû piştîgiriya me dikin" lî belê rojnamevanan ku bi Înönü re çûbûn di koşeyen xwe de tişten welê nivîsîn ku qet xwedîti li gotinên Înönü nedikirin. Em dikarin bi rihefi encameke din jî derêxin, ku dewlet çawan di nav xwe de ketîye cihekî teng û nizane ci bike welê di têkiliyan bi dewleten din re ji cih li serî teng bûye. Ëdi bekewletek jî bi diplomasia wan bawer nake. Bi dehan dewleten dengê xwe bilind nekiribin ji ne-rihetiya xwe anîn zimên. Niha ji Mitterand hatiye û hejmarek hevditinan çêdike. Em binêrin Mitterand, dewleta Tirk û Enstituya Kurd li Parîs ci li hev dikan. Bila bimbarekî hev bin.

Bi ihtîmaleke mezin Özal û Demirel dixwazin bi piştîgiri û destegiriya Mitterand partîyeke Kurd ava bikin. Ji xwe berî ku Mitterand were heta Mesut Yilmaz hemû serokê partîyen siyasi yê di parlamento de ev mina-geşê û gotûbêj kîrin. Amerîka û Elmanya ji dikarin piştîgiriya partîyeke Kurd a di bin kontrola dewletê de bikin. Ma Elmanya ne digot "em piştîgiri gelê Kurd in. Lî belê PKK terorist e".

Dewlet ji dil dixwaze bi xwe-firoşan partîyekê bide saz kîrin. Em di serî de dikarin bibêjin ku partîyeke wiha nikare piştîgiriya gel bistîn. Ji ber ku gelê Kurd yê welatparêz ëdî dixwaze sa-ziyen xwe yên neteweyî bixwe ava bike û dike jî. Bo nimûne roja 18'ê Nisanê Enstituya Kurd vedibe. Him serokê vê enstituyê jî dostê gelê Kurd û hemû gelên bindest Mamoste Beşîkçi ye. Her wiha hemû rewşenbîren Kurd yên bi rûmet jî tê de cihê xwe distînîn. Ew partîya ku bi destê kesen bêrûmet û xwe-firoş were sazkirin bêguman me navê.

Li çar aliye cihanê gel ji bo serxwebûn û azadiya xwe ser di-kin. Em serkevînê ji bo hemû gelên ku têdikoşin û gelê Kurdistanê dixwazin.

Mizginek din jî ji bo gelê Kurd: Tenê de meha Adarê de gerillayê serxwebûnê 184 livba-zî (eylem) pêkanîne. Pîroz be.

## GOTİN

Yaşar Kaya



### Evîn

Dî dînyayê de, emrê mirovan zehf kurt e, dostanî û biratiya zérîn bi destê tu kesî naakeve, jiyan bi şayê û şînê derbas dibe, di-çe. Hevaltiya hêja bi destê tu kesî naakeve, ki li piştî xwe ci bihêle ew e. Wê dengekî xweş bîmîne li dinê. Hevalteki min di helbesteke xwe de wiha dibêje: "Yezdanê min, ez ji bo xwarinê neħħi time dinê, ez ji bo hezkirina rinda hatime dinê". Evîna zarotiyê evîna xortaniyê, evîne-ke bê buha ye. Mirov xwedî xem, xeyal, fikir û guman be zehf baş e. Hêvî nîvî jiyanê ye. Kî hez naake ku jiyanek serfiraz, bi rûmet, rû sîpi, serbilind derbas bike, lî belê ev tişteke zor û zehmet e, gelek fedekariyê dixwaze. Li dinya me ya niha, di vê esrê (qirn) de mi-

rovên wiha bi pêçîyan têne nîşandan. Paqij, zelal û bê qusûr.

Hinde hevalti û rîcûyîn hene, ku mirov di hepsî de di nav têkoşîna doza xwe de bi hev re dimeše, wê çaxe her tişt xwiya dibe, yên bi dil û hinav, yên serbilind, yên alîkarê hevalan, yên doza serhîdanê dajon derdikevin holê.

Çiqas xortenê welatparêzîn Kurd hebin ji yana wan gişkan mîna hev e. Riya me di he

Helsînkî Watch di rapora xwe de diyar kir:

# 'Îşkencekirina zarokan li Tirkîyê ne nuh e'

Metin Ciwan

Di hundirê du şerên dawîn de li Tirkîyê, li gelek deveran zarok hatin îşkencekirin.

Hinek ji wan zarokan, laşê wan dane elektrikê û hinek jî, ji bo daxwaziyê xweyî sek-suelî bi kar anîn û hinek jî di felaqê re derbas kirin.

Organîzasyona navneteweyî ya mafê mirovatiyê Helsînkî Watch di rapora xweyî dawîn ya nehan de, bi firehî

li ser rewşa mafê mirovatiyê li Tirkîyê sekînî. Rapora vê carê bi gelempêri li ser rewşa zarokan li Tirkîyê sekiniye. Beşek ji vê raporê bi şeweyleke fermî (resmî) li Tirkîyê di 27 ê meha çile 1992 an de li İstenbolê hatibû amadekirin.

Rojnamevan "Haso" di rojnameyekî Swêdî de ku navê wê Proloteren e, de li ser vê raporê bi firehî sekiniye.

Zarok li ser îşkencekirin qise dike

## Gelê Kurd astî, azadî û wekheviyê dixwaze

Felat Dilges

Ji wextekî dirêj ve ye ku li Tirkîyê, li diji tevgera neteweyî ya Kurd siyasetek mijadperestiyê tê ajotin û provayenqetîfî amên nuh têne kîrin. Pêşveçûna tevgera rizgariya gelê Kurd roj bi roj bêhtir dîminan ditîrsîne. Xwirtbûna têkoşînê û raperînê gel tîrs û panîka dijmin zêde dike.

Gava ku em bala xwe bidin dîroka siyasiya têkoşîna neteweyî em dê bi hêsanî bibînin ku dijminen gelê Kurd herdem dixwazin tevgera azadiyê ji gel dûr, bi serê xwe û di warek teng de bîhêlin. Ev siyaseteke dijmin a ne guhêrbar e û di hemî serhildanê Kurdistanê de hatîye bikaranîn. Di serhilda-na Qoçgiri, Şêx Seid, Agîr û Dersimê de; dewleta mêtîngîhkar, berî ku gelê Kurd ji xwe re neyar bîhesibîne û li hember wî ser ilan bike, serok û pêşengîn van tevgeran "şakî", "cudekar" û "paşverû" nişan dide. Di nebaşa ya wan de propaganda dike û wan di pêşveçûna gelê Kurd re asteng dibîne. Heke kar parîkî xwîn bû û tevgera azadîxwaz piştigiriya gel stend, îcar dewlet ji alîki ve amadekariyê leşkerî dike û ji alîki din ve ji "heyetîn şiretan" dişine Kurdistanê. Ev heyetîn ku li ser he-sabîn Îstîxbarata Neteweyî ya Tirk dixebeitin bi piranî ji mebûşen xwefirosîn ên kurdnjîd (yêmîna K. İnan, H. Çetîn, A. Aksoy) an ji paşverîyê herêmê tênhilbijartin. Armanc qelskirinatevgera azadî û ji çavderxistina têkoşînê ye. Lî dema ku têkoşîn digel van têkilbûna pêş ve çû û piştigiriya gel stend, wê wexîlê dewlet dest bi qirkînînfireh dike.

Dewleta Tirk kengê ku li Kurdistanê dest bi qirkirinan kir, ji hinek deveren din ên Kurdistanê re dibisire, bi wan re baş derbas dike û heyâ tawîzen mezin ji dide wan. Di vî waftî de nimûna herî balkêş, di dema serhildana Qoçgiri, Şêx Seid û Agîriyê de tewre dewletê ya li hember Dersimê ye. Ji bo ku Dersimî besdarî van serhildanan nebin gelek daxwazîn wan têne pejîrandin û dewlet li hember van daxwazan ta-wîzkar e. Lî ev siyaseta durû li gor mercan cama pirr zû diguhere. Di bûyeren Newrozê de dewletê li Cizîrê û li Şimêx ji alîki ve gelê Kurd qîr dikir ji alîki din ve ji Nisîbinê re dibisîfî û serokîn dewletê ji Nisîbinîyan re spas di-kirin. Hê di nav de rojek derbas nebû icarî Nisîbinê gelê Kurd qîr kirin.

Di literatura tirkî de navê qirkirina Kurdistan "Tevgera paqîjîyê" (temizlik hareketi) ye. Kengê Kurd ji bo azadî û serxwebûna xwe an ji bo hinek mafê

xwe yên demokratik û neteweyî dengê xwe bilind bikin an serê xwe rakîn "tevgera paqîjîyâ" wan dipê. Me Kurdish gelek "tevgeren paqîjîyê" ditin; Dêsim, Zilan, Qoçgiri, Helepçê.. û hwd. Helepçê ji "tevgera paqîjîyê" ya Seddam û hevkaren wî ye. Dîroka me bi tevgeren paqîjîyê tije ye.

Wisa xwîya ye ku dijminen gelê Kurd, li pey "tevgeren paqîjîyê" yên bêhtir berfireh û nuh in. Ji demeke dirêj ve ye çapemeniya Tirk propaganda vî kañî dike û raya gişî ya Tirk ji bo qellamên nuh amade dike. Ji xwe Qontrgefilla, orðî, polîsû û istîxbarataneteweyî bi gelê Kurd re di ser de ne; lê qîma wan bi vî nayê, ew dixwazin ku tevê gelê Tirk bi xwe re û li pey xwe bibînin. Hinek berpîrsiyaren leşkerî wiha dibêjin: "Ku destûr bê dayîn ez dê di nav sê rojan de wîsa bikim ku li van de ran (mebest Kurdistan e) giya ji hêşîn nebin!..

Di dinê de nijadperestîya Naziyan bi nav û deng e; lê Nazi iro ketine nav rûpelên dîrokê û gelê Alman ji rûreşîya Naziyan şerm dike. Bi ya min nijadperestîya Tîrkan bêhtir har û hov e. Ew ne şerm dikin ne ji ar dikin. Digel ku bi mîlyonan Ermenî û Kurd qirkirine hê ji çavê wan bar nabe û têr nabe. Ewqas dexes û çavson in ku ji destê wan bê ewê tevê dinê qîr bikin. Ma armansa welaî Turan ci ye? Çavê wan ne bi tenê li gelî me, lî li hêşînayî û giyayên welaî me ji bar nabe.

Serleskerek Tirk û din ji wiha dibêje: "Ku pêwîst be em dê herbek iştîklalê ya din bikin". Mersîfeta herba wan a iştîklalê ci bû? Bêguman qirkirina gelên Ermenî û Kurd bû. Ji herba iştîklalê armanc qirkirînê nuh in.

Di van demêni dawî de li Tirkîyê hinnek xwepêşandan çedîbin ku pirên wan ji alî polîs û nijadperestîn Tirk ve têne birêxistin. Di van xwepêşandan de sloganên wiha têne avetin: "Tirkîyê dê ji Kurdish re bibe goristan, desten ku dirêjî polîs dibin dê bişkîn, bimre PKK, bijî İslâm, ji xwînî re xwîntol".

Ev provayen qirkirînê nûh in Divê gelê Kurd amade be, divê gelê Kurd bi dek û dolabîn dijmin nexape, divê gelê Kurd çekîn birexistin dijmin neke, divê gelê Kurd birexistin be, divê gelê Kurd welaî xwe bi-pareze, divê gelê Kurd li mafê çarînîsiya xwe xwedî derkeve.

Bageren nijadperestîyê her ku diçe xwît dîbîn lê gaziyanî binatiyê pîrr nayen bîlin.

Gelê Kurd doza mafê xwe dike. Neteweyîa Kurd ji bo stendîna mafê xwe rabîye ser piyan û têkoşîna wî heqdar e. Gelê Kurd aşî azadî û wekheviyê dixwaze

Nermîn Alkan 16 salî ye. Di dema şerê xelîçê de li dij ser hinek afiş bi dîwarêni bistana xwe ve daleqandin. Ji ber vê bi ıxbariya berpîrsiyareb dibistanê Süleyman Yolcu tête girtin. Ji ber ku di wan rojan de Tirkîyê dixwest mudaxeleyî Başûrê Kurdistanê bike, affşen wilo li xwe-siya rejîma Tirkîyê ne dicû. Nermîn 75 rojan di bin işkencan de ma. Bi alfariya 38 avûqatan hate berdan.

Rojnamevan Haso, li ser îşkencekirina zarokêni Kurd li zindana Amed (Diyarbekir) ji diseikine.

Berf niha bi demekê dîsa îşkence li ser zarokan aktüel bûbû. Tirkîyê bi îşkencekirina zarokêni Kurd rekor şikan-dibû. Pişî 12'ê şlonê, nêzî 105 zarokêni Kurd di zindana Amedê de hatin îşkencekirin. Gelek ji wan zarokan nizanibûn çîma hatine girtin. Gelek ji wan mindalan (zarokan) qet levzekî bi tirkî nizanibûn. Gelek ji wan ne xwendevan bûn. Zarok tev ji bi şeweylekî vekirî bi îşkencê, çavtîrsandî û hwd. kîribûn.

Yek ji wan zarokan Evdilleh Korkmaz bû û 11 salî bû, xelkê Çolemêrgê (Hakkarî) bû. Ji ber ku qet bi tirkî ne dizani bû, dadgeh jê re wergêrek peyde kir. Evdilleh di qisekirinê xwe de vekirî qala îşkenca leşkerên Tirkîyê kîribû.

**Rapora Watch**, qala qîzi-kek 12 salî ku navê wê Nur-an Yavuz e ji dike. Ku li ser bûyerek hinek zarok kevir avetîne cîfa polîsan û polîs hatine Nur-an girtine, li ber çavên xelkê demaçe xistine serê wê, ji bo ku li hevalê xwe mikur were.

Tê wê wateyê ku kesen bêne girtin, ji sedî pêncî an ji



nîvî ji wan bê îşkence xelas-nabin. Beyanîn rejîma Tirkîyê tim pozitîv in lê çiqas di-çe, îşkence zêdetir dibe û ne-rastiyê wan derdi Kevin der ve.

Haso di dawiya nîvîsa xwe de li ser yarmetiya welatên mîna Emerîka yên ku alfakîriyê mezîn didin rejîma Tirkîyê sekiniye. Ji ber ku dibêjin ev alîkarî riya demokrasiyê li Tirkîyê dê veke, hêviyan mezintir bike. Lî Tirkîyê van peran bi

şeweylekî xerap li hember şer-vanen PKK bi karîne. Li Tirkîyê tim pozitîv in lê çiqas di-çe, îşkence zêdetir dibe û ne-rastiyê wan derdi Kevin der ve.

Di dawî de gotineke Kenan Evren hatîye nîvîsandin. Dibêje: "Zarok ji ji bo yekîti û xweşîya dewletê hatin gir-tin."

## General û dewlemend kurên xwe naşînîn şer

Di kovara "2000 e Doğru" de nîvîsarek interesant bala me kişand. Di vê nîvîsarê de çend navê navdar derbas dibin. Kovar, navê zarokêni dewlemend û generalan ên ku eske-riya dewletê nakin, yek bi yek diyar dike. Ev dewlemend û generalan ordiyê, 10 hezar Mark didin, zarokêni xwe dişînîn Bodrûmê li ber devê der-yayê mehekê eskeryê bi wan didin kirin û dizivirin malen xwe.

Dewleta Tirk, di Kurdistanê, li ser xwîna xorten Anadolê yên xizan (feqîr) rîdike Kurdistanê, dixe nav şerê gemar û dide kuştin. Ü ji dê û bavêن wan re dibêje ku, PKK anku Kurd lawên we dikujin. Bi vî awayî ji, dixwaze ku neyartiya gelê Tirk a li hemberî gelê Kurd tûjtîr bike. Anku gelê Kurd û Tirk ji hev re bixe ne-yar û ew bi xwe selteneta xwe bidomîne.

Dewleta Tirk, li ser xwîna xorten Anadolê, li ser xwîna lawên gundiyan Tîrkan û Kurdistan selteneta xwe didomîne. Zarokêni xelkê rîdîkin şer û ew ji kîfa xwe dikin. Gelê Tirk divê ku vê rastiyê baş bi-

zanibe, mejiyê xwe edî bas bide xebitandin, edî ji bo sel-teneta generalen nijadperest lawên xwe nekin gorî.

Gundî û karkeren Tirk, çi-ma lawên generalan wek yên Doğan Güreş, Kemal Yamak, Haydar Saltik, Adnan Doğu, Sabri Deliç û lawên dewlemendan wek Korkut Özal, Y. Bozkurt Özal, Ali Bozer, Mü-kerrem Taşçıoğlu, Ali Şen, Hasbi Menteşoğlu, Cevher Özden, Türkân Akyol û hwd. li ber keviya behre kîf dikan. Lî lawên we li Kurdistanê, hemberî têkoşîna gelê Kurde mafdar têne bikar anîn û têne kuştin?

# Rukeniya Metika Mariya



**Zeynel Abidin Kızılıyaprak**

Di bîranîna min a zarokî de "Metika Mariya" cih girtiye. Di van rojên dawî de Metika Mariya disa hate bîra min. Gava ez zarok bûm, Mariya her car di hat navça me ya Samsatê û bi rojan dima. Mariya pîrejineke navsere û ji Emerikayê ye. Dema Mariya dihat navçeya me, pê re sê xortên Emerikî jî hebûn. Ew xort jî bi Mariya re dihatin û diçûn.

İryâ le dinatîn û diçün.  
    Ez li vir qala salên 1965 û 1970 an dikim. Mariya bi rûyekî dev bi ken û bi noqilên xwe ve dihat û li zarokan şekir belav dikir. Dilê zarok û gundiyan xweş dikir. Di demeke kin de me jê hez kir û Mariya li herêmê rel dibêje, ji bo Kurdan "şefqet" lazımlı.  
e. Anku hikûmet li hemberî Kurdan wê bi rûken be. Wek Metika Mariya. Lêt navbera hikûmeta Demirel û Mariya defterqek heye. Di pişt kena Mariya de dîzikirin hebû, lê di pişt "şefqeta" Demirel de xwîn heye

nav ū deng da

Me nedizaniya û nayê bîra  
min, gelo wezîfa Mariya ya  
fermî ci bû? Lê ez niha bi  
hêsan dikarim bibêjîm ku ew  
mîsyonereke dagîrkeriyê bû.

Samsat navçeya şaristaniyê ye, bi Adiyamanê ve girêdayî ye, Samsat ji aliyê bermayên kevnare yê dîrokî ve gelek dewlemeden e. Politi-

Dema ez li politika hikûmeta Demirel mîze dikim, Mariya tê bîra min. Demirel dibêje, ji bo Kurdan "şefqet" lazime. Anku hikûmet li hemberî Kurdan wê bi rûken be. Wek Metika Mariya. Lî navbera hikûmeta Demirel û Mariya defterqek heye. Di pişt kena Mariya de di-zikirin hebû, lê di pişt "şefqeta" Demirel de xwîn heye

ka asimilasyonê ya dewleta  
Tirkiyê wê demê mejiyê me  
şüştibû, me nedikariya li  
nirxên xwe yên neteweyî der-  
kevin. Me ew bermayên xwe  
yên neteweyî wek ax û ke-  
virên beredayî didîta. Ji lewre  
em ji kesaniya xwe û nirxên  
xwe hatübûn dûr xistin. Haya  
me ji me û ji nirxên me yên  
neteweyî nîn bû.

Belê Metika Mariya  
ji me re tiştên şérîn û  
kincên rengîn tanîn û  
kêfa me xweş dikir.  
Mariya hînê zimanê tir-  
kî jî bûbû û caran bi tir-  
kî dipeyviya. Me wê  
demê digot ku Mariya  
dev ji jiyana xwe ya re-  
het berdaye, hingî ji me  
hez dike divê ku bi me  
re di nav van hoyêñ dij-  
war de bijî.

Du-sê mehan carek zilamên Mariya bi erebeyên xwe ve dihatin Samsatê, "kevirên" me yên bin erdê berhev dikirin, li ereban bar diki-

Di her şiyarbûn û raperînek de divê mihasebek hebe. Min Metika Mariya ji bir nekiriye. Kesên ku me dişelînin, divê ne kêfa me, lê kîna me ji wan re hebe. Ji bo ku ne îro, ne jî sibê em bi kesên devlikên û rûgeş nexapin. "Şefqeta" Demirel û kena Mariya talan û xwînrijan- din e.

rin û diçûn. Caran ji helîkoperê Mariya dihatin "kevirên" me bar dikirin û diçûn. Belê Mariya gelek ji me hezdikir. Ji me re digot: "Ev kevir ez wek yadîşgar dihesibînim. Ji ber ku ez we ji bîr nekim, van keviran rîdikim welaletê xwe."

Mariya bermayêñ me yên kevnare û neteweyî talan dikir, lê me nedizanî, wê demê me rûmet nedida van "keviran", Mariya ji digot: "Ev tiştên bê qîmet in". Lê Metika Mariya ji bo van tiştên "bê qîmet" bi mehan li ba me dima û ev kevirêñ bê qîmet bi helikopteran rîdikirin welatê xwe. Lê me ji Mariya bawer dikir. Ruyê wê her tim dike-niya. Kêfa me tevan jê re dihat. Metika Mariya gelek baş dizaniya me bixapîne. Belê Metika Mariya bi rûkeniyê,

nirxên me yên neteweyî talan dikir. Lê Mariya di vê talanê de hîc xemgîn ne bû. Ev tak-tikêñ han yên wek Mariya li Kurdistanê qet kêm ne bû. Ev tak-tik li Kurdistanê hîna jî bi sêweyeke din berdewame.

Dema ez li politika hikûmeta Demirel mêze dikim, Mariya tê bîra min. Demirel dibêje, ji bo Kurdan "şefqet" lazim e. Anku hikûmet li hemberî Kurdan wê bi rûken be. Wek Metika Mariya. Lê navbera hikûmeta Demirel û Mariya de ferqek heye. Di pişt kena Mariya de dizikirin hebû, lê di pişt "şefqeta" Demirel de xwîn heye.

Di van rojêñ dawî de gava  
em rojnameyên Tirkan dixwî-  
nin, tiştên ecêp dibînin. Qe-  
lemşorêñ paşverû û siyaset-  
vanêñ Tîrkiyê dibêjin, "li  
Kurdistanê tu tişt nîne, tu  
tiştê Kurdan tune, wê çawa  
Kurd dewlet ava bikin û çawa  
bijîn? Ev tiştekî bê imkan e."  
Belê ji aliyeñ ve Kurdistanê  
talan dikin û ji aliyeñ ve jî  
wiha dibêjin. Wek dizokerê  
ku xanî dişelîne û dizivire  
xwedîyê malê dibêje: "Di xa-  
nivê we de tistek nemave."

Belê di her şiyarbûn û raperînek de divê mihasebek hebe. Min Metika Mariya ji bûr nekirive

Kesên ku me dişelinin,  
divê ne kêfa me, lê kîna me ji  
wan re hebe. Ji bo ku ne frô,  
ne sibê em bi kesên devlikен  
û rûges nêxapin.

"Şefqeta" Demirel û kena  
Mariya talan û xwînrijandin  
e.

# Dewlet dengê demokrasiyê difetsîne

**K**omela Çanda Demokratik û We-latparêz ji bo çapemenî û raya giştî daxwiyaniyek belavkir.

Waliyê Istenbol Hayri Kozakçioğlu, kcmela çanda demokratik û welat-parêz da girtin. Di 8.4.1992 an de polis bi ser komelê ve digirin, li komelê çiqas pirtûk, kovar û rojname henin tev berhev dikin tevî 10 endamên komelê bi xwe re dibin, kîlît davêjin ser deriyê komelê û digirin.

Zordestiya hikûmetê, di van mehêن dawî de li ser komeleyên demokratîk her diçê dijwartir dibe. Hikûmet ji aliyeq ve qala demokrasî, mafêن mirovan û bilindahiya huquqê

dike, ji aliyek ve jî zordes-tî û tadayiyê li ser gel zêde dike. Ev durûtiya hikûmetê ya herî mezin e.

Berpirsiyarê komela çanda demokratik û welatparêz dîtinên xwe yên di vî warî de wiha diyar dikin: "Dewleta Tirk ji aliyeq ve bi tanq û topêxwe êrîş dibe ser gelê Kurd. Wek di Newrozê de bi dehan kesên sivil dikuje, dîsa bi destê kont-gerila welatparêzan dide kuşin, ji aliyeq din ve jî zordestiya xwe ya li ser komel û kovarê demokratik zêdetir dike. Dewlet bi vê şeweyê dixwaze ku dengê azadî, serxwebûn û demokrasiyê bifetisîne. Lê em jî wê li hemberî vê zordestiyê rawestin."

Dayîka êsîran Xetîce Altun:

# 'Ez bi şev û roj guhdara welêt û girtîgehê me'

-Dayîka Xetîce tu ji ku yî?

Ez ji Dêrsimê me

-Ji kînga ve hûn ji Dêrsimê derketine?

Ez salan rind nizanim pêk bînim, belê ji dema Osmaniyan ve bav û kalê min koç bûne.

-Dewleta Osmaniyan hûn koçî kîjan bajarı kirin?

Em koçî Sêwasê kirin, pişte Re Qeyseriyê, ev 25 sal ji em li Enqerê dijin.

-Çend zarokên te hene?

7 zarê min hene. 3 qîz û 4 kur.

-Ev zarokên te li ku dijin tu ji kerema xwe re karî ji me re bîni ziman?

Belê, kurê min, Heyder Altûn 12 sal şoreşgerî û şerê çekdarî kir. Di 1990 an de li Botanê di şerê çekdarî de, bi birîndarî kete destê neyar, paşê me bihîst ku erê rast e. Ez çûme Amedê, tu cih nema ku ez negeriyam, ez çûme nik walf (Kozakçioğlu) ez çûme nik serleskerê qolordiyê, gotin, lawê te me negirtî ye, bi navê Haydar Altûn li nik me girtî mirovekî wisa nîne. Ez çûme nexweşxanê min li wê derê jî nedîf, paşê min seh kir kurê min bi birîndarî di lêdanxanê de bû. Hikûmatê di şûna ku ew biribana nexweşxanê sax bikirana, bi çoyê kotevê dagheha lawê min dikişin, kurê min ku sîrre xwe nedâ zebanî yê cehnemê di binçav (gözaltı) de kuştin, meytê wî jî nedane me.

-Ma we tu doz li wan nekir?

Kurê min tê gilyê kî li kî bikî?

-Zarokên te yên din li ku ne?

Lawê minî din di girtîgehê de ye, bi navê xwe Riza Altûn e, ji berî 12 llonê ve di girtîgehê de ye, vêca hesêb li cem te bê ev bûye çend sal... yet ji keça min jî ev 12-13 sal in ku derketî ye xerîbi yê, ew jî neyar lê pirs dikir, ew rehet nedîhiştin, zarokê min ên din jî li nav bajarê Tirkân in, fro ez û pîremêrê xwe tenê mane, belê yet nevyê min tenê li nik min dijî.

-Ji zû de tu ji welatê xwe qetyayî, tu bêriya welatê xwe nakî, ci çax tê vegerî welêt?

Belê rast e, ez ji zûde ji welatê xwe qetyame, dûr ketime, ez fro dixwazim vegerim welatê xwe. Belê ma'ez ji xweşîya xwe ji welatê xwe dûr ketim? Na. Hikûmetê bi darê kotevê em di vir re derxistin. Di dilê te de em bi xweşîya xwe li bajarê romiyan dijîn,

welleh û billeh bi serê te bi min mirin e. Zarwên min tevdi ber doza welat de hatine qirkirin. Ji ber vê yekê em doza xwe dajon, ji bonî em vegeŕine welatê xwe.

-Lawê te yê di girtîgehê de tu bêriya wî dike, girtina wî bi te çawa tê?

Ez bêriya Riza yê xwe çawa nakim, ji bonî dîtina wî ez

Xwendina min tune ye, lê ez bi tirkî dizanim biaxivim. Hingî ku ez çûme girtîgehê dîtina lawê xwe ez hînî ziman ê tirkî bûm.

nin? An ez dayika kî me? Ew bi min hene, ez jî bi wan he-

wan himbêz dikim, paşê ez li dîtina zarokan, leşkerek li cem me diseokinî yek jî li cem lawê xwe dipirsim.

-Dema tu diherî dîtina êsîre şoreşê karbidest ê girtîgehê weke ci koteviyê rî te didin?

Dema ku Esat Oktay Yıldızan karbidestê girtîgehâ Amedê bû, tevlî leşgerê wî gelek tiştîn xirab ji me re digotin, gelek sixêf ji me re di-

dîtina zarokan, leşkerek li cem me diseokinî yek jî li cem zarokan. Leşkera li nîvî çavê me dînîhertin. Leşker ji zarokê me re di gotin, ev kî ye, ev pîreka hanê çî te ye, ev qîza hanê çî te ye, ku zarokê me digotin ev xwîşk û dâyîkê me ne. Paşê leşkeren romî digotin em ha wiha bi dayik û xwîşkê we bikin... Sixêf ji me re didan. Ji ber vê yekê gelek caran zarokê me digotin nema werin dîtina me.

-Rêça lawê te ci ye?

Rêça lawê min PKK ye.

-Tu vê rîçê çawa dibînî?

Ez vê rîçê rast dibînim. Ez bi rîçê lawê xwe şannaz dibim.

-Tu poşmanbûna te ji bo ni bir û baweriyê lawê te hene?

Lawê min ji bonî doza weletê xwe ku ketî ye nava rîçê PKK ez loma şannaz dibim.

-Tu çend caran ketiye rojiya birçibûnê?

Êsîre şoreşê çend caran ketibin berxwedanê ez jî ewqas caran ketime berxwedanê.

-Xwendin û nivîsandina te heye?

Xwendina min tune ye, lê ez bi tirkî dizanim biaxivim. Hingî ku ez çûme girtîgehê dîtina lawê xwe ez hînî ziman ê tirkî bûm.

-Dema ku hêşirên şoreşê dikevine, rojiya birçibûnê tu ji ku dibhisi?

Ez bi şev û roj guhdarim, guhdarê welat û girtîgehê me ez çawa nizanim kurê min, ma karê min ciye...

-Tu li kîjan bajaran ketiye rojiya birçibûnê?

Ez li Eskişehirê, li Enqerê, li İstembolê, belê ez bi pirayî li Enqerê ketim rojiya birçibûnê.

-Dema ku êsîren şoreşê dikevin rojiya birçibûnê, xwarin bi te çawa tê, wê çaxê kezeba te dişewite li ser girtian?

Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.

Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.


Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.

Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.

Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.

Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.

Ma çawa kezeba min naşwîte, dev ji xwarinê berde, av bi tenê di xûzya min re naçe, ew nexwin ez jî naxwim. Heyanî ku mafêن xwe nestînîn êsîren şoreşê, û dev ji rojiya birçibûnê neqerin, xwarin li min heram e. Ji bo êsîren şoreşê bîghine mafêن xwe, gel li her derê berxwedanê dike, ez jî di vê berxwedanê de tim cih distînim. Em, meşa çê dîkin, carekê em meşîyan heyanî meclîse. Lî, bê bavan ez girtim 2 mehan ez xistime girtîgehê, ji bo ku ez meşîyam û ketim rojiya birçibûnê.



tucarî nawestim, serê min bilind e ji ber lawê min tiştekî xirab nekiş ye, tu kes ne şelihandiye, mîr ne kuştiye, jî nerevandiye, lawê min tişte bi rûmet kiriye, ji bonî doza weletê xwe hatiye girtin. Ez şannaz (iftihar) di bim bi lawê xwe.

-Tu, tu cudabûnê dixî navbera lawê xwe û hevalê wî, yanê tu pir ji lawê xwe hez dike an ji hevalên wî?

An lawê min an jî rîhevalê wî, di hezkirinê de tu cudabûn li cem min nîne, ji xwe hemû lawên min in, ez jî da-yika tevan im, ma lawê kî

me, yek ji me bê ê din nabe... Dema ku ez diherim dîtina lawê xwe di destpêkê de ez li rewşa hevalan pirs dikim. Ez

dan axilbe jî ji dayik û keçan re.

-Weke ci sixêfan?

Kurê min bi serê te nayê gotin. Devê wan bêbavan geleki lewitî bû, pêş û paşê me didane ser hev... hingî bê esil û bê xîret bûn, te digot qey ji mirovahiyê nesîbê xwe nestandibûn. Sixêf, tifîn, ankuşk, pihi, çîrê nemayı bi me di kîrin. Ji bonî 3,4 deqe dîtina zarokan, bê ci bi serê me dikişin, bi serê êsîren şoreşê sed taq dikirin. Leşkerê Esat heyanî ku zarokê me dibirin û tanîn li zarokê me siwar dibûn. Dema ku em diçûne

Heppevîn:Ş. Arjen

# Gelê Kurd ji rewşenbîr û nivîskarêne qure hezname!

M. Ali Tüysüz

Mirov dikare gelek dîtinâ li ser û derheqê rewşenbîren Kurd de pêşkêş bike. Di van salêne dawî de di vî warf de pir tişt hatin gotin. Bi kurtî mirov dikare bibêje ku rewşenbîren şoreşger vê tarifê di parêzin; Kî, bi nivîs, axaftin, tevger û karûbarêne xwe, ji bo hişyar û azadbûna gelê xwe xizmete bike û xwe ji bo vê amade bike, ew rewşenbîr e. Lê, li vê derê dikare her kesê ku dinivîsine xwe wek endamekî vê qatêriyê bihesibîne û xwe wek yek ê ku ew tarîfa li jor tîne cih nîşan bide û bibêje "ez dinivîsînim, ez rewşenbîr im û ez wezîfa xwe tînim cih.

Belê ev tewr di şûnê de nîne û ne tewreke durust e. Ji ber ku her kesê ku li ser pirsa Kurdan bîr û baweriyen pêşkêş dike, nikare her dem ji vê qatêriyê bê hesab kirin. Çawa? Ji ber ku ji pêşkêskirina baweriyen zêdetir, baş tesîrkirina bîr û baweriyen "rewşenbîran" dike rewşenbîr. Li aliye din teşîr dikare gelek negatîf be û hisen dijberî (bi tepki) xwe nîşandin. Li vê derê mirov dikare behsa rewşenbîren ku bi kurdi dinivîsînim, bike. Heta çend salan berê, rewşenbîren ku bi kurdi berhem derdixistin holê û di kovar û rojnameyan da dinivîsandin ne gelek bûn. İro jî ne gelek in. Lî, iro, ji doh zêdetir in û dê roj bi roj hîn jî zêde bin. Rewşenbîren ku berê bi kurdi dinivîsandin bi qedr û qîmet bûn. Ji ber ku hindik bûn. İro jî ê ku xebatêne pak û lêkolînê pêwîst dike bi qedr û qîmet in. Li vê derê mirov dikare behsa M. Emin Bozarslan bike. Mamoste Bozarslan, di van sîh salêne dawî de Alfebe, Mem û Zîn, Jîn û Kurdistan û gelek berhemên din yên hêja weşand û li gor plan û programekî sistematik dê di salêne pêşya me de, gelê Kurd bike xwediyê gelek lêkolîn û berhemên din. Mal-mîsanîj ji di warê lêkolîn û weşandinê kurdi de gelek bi nav û deng e. Ew herdu rewşenbîr û nivîskarêne Kurd bi berhemên xwe yê baş û hêja xwe dane qebûl kirin. Ew tene hezkirin. Ji ber ku di pirtük û nivîsîn wan de quretî tune. Tesîra berhemên wan dîrokî be jî, piir in. Ew nete-weyiya Kurdan xwirt dike. Herwiha, li kîleka berheman, yanê encaman, karekterek mutevazî û ne kariyerist, ew dane nasandin, û kirine navêni bi qiyem. Ew rewşenbîr û welatparêzen hêja erk û wezîfeyen xwe tînin cih. Di van salêne dawî de gelek rewşen-

bîren wilo hêja çê bûne û dê di salêne pêşya me de jî dê çêbin.

Lê, li aliye din, çendek he-ne ku xwe rewşenbîr, pispor, zimanzen dihesibîn û dix-wazin xwe wilo, bi vî reng û awahî bidin hezkirin. Ew evîndarê (esqê) xwe û navê xwe ne, hergav û li hemû de-ran behsa xwe dikan. Bê wêne (foto) ne mumkun e mirov rastê nivîseke wan were. Xwe pesn û meth kirin di bîrûbawerî û jiyana wan de di giraniyê de ye. Di balaferan (teyare) de bîra cemidî vex-warin û endamê nizamî kîjan qulûb û yekîtiyê bûyin ne gelek giring e û ne jî gele Kurd enterese dike. Bi van quretiyan xwe qedr û qîmetkîrin û firotin takîkeke erzan e. Ne çend meh di girtigehê (he-pis) de raketin ne jî nizam kîjan kovar îdare kirin, mirovan bi rûmet dike, wexta ku bi he-zaran Kurd bi deh salan di van girtigehan de li dij zulm û zor û işkencê li berxwe didin û her mehê bi sedan xort ji bo jiyaneke azad têne kuştin.

Helbet zanîstî (film) tiştîkî xweş e. Helbet di derheqê dî-roka xwe û zimanê xwede xwedî zanebûn gelek pêwîst e û divê di vî warf de hemû welatparêzen xwende û xwendekar gavên girs bavêjin. Lî, divê zanîstî, qabiliyet, heysiyet û şexsiyet, di xebata siyasi de, siyasi bin û xizmeta bîr û baweriyen siyasi bikin. He-ger mirov zanînê ji bo şexsê xwe û ji bo nasandina xwe bi-meşne û bikarbîne wê çaxê zanîstî dikeve xizmeta şexs û ferdan. Lî, em hemû dizanin ku cihê slogan "ilm ji bo ilm" an jî "ilm ji bo ferd û kesbûnê" di zanîstî de tune û nayê parastin. Yanê heger film û zanîn, ji bo pêşvebirina ferd û şexsan bibin wasite, xwen-devan û xelk guh nadîn wê zanîn û qedr û qîmet jî nadîn xwediye wê zanîn. Ji bo vê ji tesîra vê zanîn û vê pisporiyê li ser mirovan sîfir e. Heta te-sîreke negatîf jî li mirovan dike. Ji ber ku mirov naxwaze bîr û baweriyen qure bi-parêze. Ji xwe mirov qure ji zanîn bêtir, xwe fêrê mirovan dike. Ew, xwendevanan bi quretiya xwe perwerde dike. Civîn, konferans, nivîs û pirtükîn (kitêb) wan, bi wan re hevpeyvîn perwerdekirina qureti, pozbilindî û xwe na-sandinê ye.

Mirov nikare vê qureti û pozbilindî qedexe bike û pêşî li pesn û methen xelkê bigre. Lî, heqê herkesi jî heye ku rewşenbîre wiha di vî warf de hişyar û agahdar bike. Ji ber ku rewşenbîri qureti nîne. Siyaset jî ji rewşenbîran cid-dibûnê dixwaze.

# Şehîd bîr û baweriyen gel in

Ol û bawerî du tiştîn nêzî hevin. Tesîren wan li ser hev gele-kî hene. Berê ol tunebûna, gel heta iro ne digihan vê rewşê. Di rewşa dîrokî de olê cihekî giring girtiye. Heta iro jî piir kesan dev ji ola xwe bernedane. Bi ser olan re çiqas dem-derbas bûbin jî, ji me re bîr û bawerî hiştine. Bi vê sedemê û gelek tiştan insan lazimiyen xwe bi cih tînin. Wek gûştin û şewitandina miriyan û hwd..

İro berî ku ez nameyekê ji malbateke şehîd re binivîsim, cûm nav cihekî bi dar û ber. Li wê derê şînahiyek xweş hebû. Dûre min tîrb dîtin. Derdorêne mezelan, bi darêne çîçekan û her tiştîn ku têne hezkirin lê gerandibûn û xemilandibûn. Ez nêzîkî wan tirban bûm. Sînorêne tirban bi gûlén xweş û bi bêhn hatibûn vegetandin. Ew çîçekên ku danibûn ser tirban hin ji wan hê şîn bûn. Li aliye din malbatêne miriyan ser tirben xwe paqîj dikirin. Ev mîzandinâ min li Almanya, li bajarê Bochumê çêbû.

Dûre min şehîdên welatê xwe yê Kurdistanê anîn bîra xwe. Min xeyal kir, ku ez niha li welatê xwe bûma, min dê ji wan re cihekî pêwîst amade bîkira. Lî belê iro ez ji wan dûr im. Nêzik ne dûr, li welat gava mirovek dimir, yan ku dihat kuştin, şîn çêdibû, qehr dikirin û bê çare dibûn. Dawî dihatin



ji bir dikirin. Bûyer çêdibûn lê belê, hevgirtin zêde tunebû. Gava em niha yanî li vê demê dinêrin rewşa ku hatiye guher-tin piir giring e. Kîne yêrewş guher-tin? Herkes zanin, ji şehîdân pêve ne tu kesî din in. Şehîd bûn tîvî erdê jiyana me. Şehîdên Kurdistan jiyana guher-tin.. İro gelek şehîdên qeh-reman yê bênav hene. Lî ew dîsa bir û bawerîya gel in. Ji gelê me re riyeke nuh hatiye avakirin. Ev rî riya serxwebûn û azadiyê ye. Azadî û serxwebûn jiyana paqîj e. Ev jiyana şehîdên me derxistine. Gelê me şehîdân bê mirin dikin. Dev ji wan bernadin. Tev li pey wan in. Ji bo wan raperin û serhildanan çedîkin. Gelê me di vê jiyana nuh de, li temamê

malbatêne şehîdân xwedî derdîkevin. Navê wan li xwe û li zarokên xwe dikin. Yê ku jiyanen xwe paqîj kirine şehîdên me tenê ne. Bi xwedî derketina wan ince em kari-bin bijiyana xwe paqîj bikin.

Wezîfeyen giring dikevin ser milen me. Girîng e em xwedîderketina xwe bidomîn û ji her demê zêdetir têbikoşin

Bîr û baweriyen me, ji her demê bêhtir xwirt bûne û xwirt dîbin. Hevgirtina bi şehîdân re, bi malbatêne şehîd û girtiyan re me xwirt dike û ber bi welatekî serfiraz û serbixwe ve dibe.

Ehmed Xelîfi

## XAÇEPİRŞ


Amadekar: Nijad Yaruk

### ÇEPEKAST:

1-Serokê tevera 1925 an, di wêne de tê dîtin/ Bi zimanê biyanî hewa/ Baş bûn 3-Di dî-roka Kurdistanê de navê şex-siyetekî, bi navê Ezdînşer jî tê naskirin/ Di rîwîtiyê de bi kîrî barkirina cil û eşyayan tê. 4-Bi erebî çav, dîd/ Navê celebek nebat/Kokbirkirin, xirkirin 5-Ew stérkên ku wek ewran tê dîtin/ Sembola îrî-diûm/ Risim/ Sembola Os-mûm 6-Li Rojhilata navîn navê neteweyekî/ Deng, dengê bilind 7-Bingeh, hîm/ Li Ewrûpa navê neteweyekî 8-Li Ewrûpa navê komeleyekî ku li hember Ingiltereyê ji bo xelasîya Irlanda Bakûr şer dike/ Li Emerîka navê herêmekê nezîkî/ anadaye 9-Mîrên ku wek jinan li xwe di-kin/ Sembola Nikel 10-Sembola Berkeliûm/ Li eske-riyê navê rutbeyekî, general/ Navê listikek wek setrancê 11-Bi kîrî lêxistina enstrûmanan tê/ Bi zarava so-ranî qanûn 12-Cihê daxwîyan-weriya sewal û însanan/ Navê rojgeranekê

### SEREJER:

1-Yê ku bişev nabîn/ Di dengê mîrande yên en qalind 2-Baneşanek bankirinê/ Bi zimanê biyanî erê/ Welatek li Rojhilata navîn 3-Şagirt, telebe/ Sembola Proseodîm 4-Dezgeh, avahî/ İnat/ Celebek qumaşê bi buha 5-Muhendîs/ Fûrandin 6-Bi erebî bajar/ Nişandeka hêdanê, nîda 7-Zivistana li derve cihê çerandina sewalan/ Kinnivîs-dina litre 8-Kar, şixul/ Fikr/ 9-Yê bej-nawî bilind/ Hebûn, serwet 10-Celebek şerînayî yê/ Bergah, üfkê 11-Li Tirkîyê navê komeleyek çep, ku li dijî re-jîmê şer dike, kin nivîsawî/ Nêzik, nedûr/ Navek mîran 12-Li Efrîqe navê welatekî 13-Sûka elafan 14-Jinê ku bi yek zilamî re zewicîbin, her-yekî li gorê din navê wê 15-Celebek sîporê 16-Êsîr, girtî



### BERSİVEN XAÇEPİRŞA HEFTEYA ÇUYI

ÇEPEKAST: 1-Ereb Şemo/ Pîspor 2-Newroz/ Rd/ Na/ Rûm 3-Televîzyon/ Fedaî 4-Elem/ Trajedi/ Ema 5-Kefî/ Newêrek 6-Essans/ İthal 7-Ker/ Lîra 8-İma/ Lo 9-Üd/ Da/ Lîr 10-Asteng/ Ma 11-Laper/ Kolan 12-Ron/ Qûran

SEREJER: 1-Entelektuel 2-Reel/ Se/ ar 3-Ewlekarî/ Apo 4-Bremen/ Resen 5-Şov/ Fsln/ Tr 6-Ezîti/ İade 7-Zr/ İr/ Ankû 8-Oryantal/ Safir 13-P. 14-Ordek 15-Rûam 16-Mîad

# NEQUŞ

Amadekar  
Aram Çem



Bila kuştiyê şêran bim ne girtiyê  
roviyan bim

## **Gotina peşiyêñ Kurdan**

# Çi bi wan nakeve

Dostekî min hebû navê wî Reşit Beg bû. Ji albâyîtiyê teqawîd bûbu. Ji eşîra Cisra-na bû û lawê apê şehîdê me-yî binav û deng Mîralay Halid Beg bû. Gerçî bi emir ne-geba nêzîkî 40 salî hebû lê Reşid Beg bi çavê hevalekî xwe li min dînerî. Çavên wî qels bûbûn, carê min kîtêb dîbir jê re dixwendin. Ro-jekê car din di bîra min de ye min xatireyên Bismark jê re dixwendin. Eşqa wî di Al-manan de bû. Sê qîzên wî û lawekî wî hebûn. İca yabo ma lawa lawbû. Di lîse de dixwend tişt di mala xwe de nehiştibû, heta demaça bavê xwe bazinêni diya xwe û xâ-liçen hundir didizîn, dîbirin difrotin. Derewêni dikirin ecêb bûn. Rojekê cardî min ji Reşid Beg re dixwend, navê lawê wî Mehmûd bû. Ez û Reşid Beg li odakê bûn û Mehmûd, diya wî û xwihêni wî û zarokêni min û diya wan li salonê rûniştibûn. Mehmûd ji wan re diştexili. Carekê Reşid Beg ji min re got bise lawo, Müşa bise, go: Dengê Mehmûd tê te. Min go, e. Mehmud digo îmana min ji

derewan re dire. Ma qê ïn-sanê bi namûs be diziye di-ke. Reşîd beg li min nêrî û keniya. Go, binêr lawo Mu-sa, Mehmûdê me ne bi tenê diz û derewîn e, ehmeqe jî. Min go, çima apo? Go lawo



*Ji kovara Tew la*

gere bigota, carna ku li mirov teng bibe mirov tiştekî didize yan jî ji bo mudefa xwe derewekê dike. Hema rebeno gerek tu senetê xwe hebekî mudefa bike. De ne mîrik bê aqil e. Tim ev serpêhatiya min hikûmeta Tirkîyê tîne bîra min. Bê çawa ciwamêrî û namûs bi Mehmûd nediket bi hikûmeta me jî nakeve, de binêrin dê dibêن çi: Îsal 60 sal in û niha jî li Tirkiyê heqê însanan tune. Lê cemiyetekê çêkiribûn jî bo heqê heywanan. Tên Şirmexê Keçikên neh salî dikujin, la-wikên 13 salî dikujin îxtiyar û pîrên 70 salî dikujin, ew vê wek qehremantî xwe di-hesibînin. Lê masiyek ji Rusya reviya hat dora Sînopê Gerze, hikûmet û xelk rabûne sir lingan hewarê, dibên emê vê masiyê çawa xelas bikin. Yanî li pêş din-yayê dikin ku va ye Tirk ev-qasî medenî ne û bi merhemet in. Ev derew û sextekariyên wan wilo pirr in. De îca elhemdulilah dinya bi wan hisiyaye, bûne wek Mehmûd û Reşîd beg.

*M. Anter*

# TÎR

Musa Anter

**Êdî kes nikare godtê me  
bi hev bide xwarin**




**B**i sedsalan, fêleke dijminên Kurdan hebû, em berididan hev. Hewqasî em perçekiribûn ku, her eşireke Kûrdan jî kiribûn dido, sisê. Mesela di Kurdistanê de piştî eşîra Barzaniyan, eşîra Omeriya tê. 90 gund in, ji Luksemburgê mestir in. Lê hikûmeta Osmaniyan û dûre TC ev eşîr perçe perçe kiribû û kirubû dijminên hev. Mehmûtkî û Etmankî tevlî axayên xwe giş lawê apêñ hev bûn, lê tev dijminê hev bûn. Wek Mala Osman, Mala Silêman, Mala Smaîl û Mala Tahir.

Ez dinêrim ev nesaxiya hikûmeta me yê niha, ji vir tê. Kurd şiyar bûne, nema didin dû malan, nema didin dû eşîran jî. Bûne vek, bûne milet. Dijiminatiya nava wan bûye biratî.

Berê ku min li rewşa mîletê Kurd dinêrî tim ev çiroka dîrokî di-hate bîra min. Çirok wiha ye: Dibê li wenatekê mişkên cerboh mi-selet bûbûn. Zad û dexil bi wan ve nehiştibûn. Hakim aciz mabû. Sofiyek tê ji hakim re dibêje ez karîm van mişkan biqelînim. Ha-kim dibê, de her kuro, tê çawa biqelînî. Sofî dibê yabo min tu pe-re ji te navê, tiştê heye qefesek hesinî mezin ji min re çêke û bila gundi, mişkan bi saxî bigrin weynin bifroşin te. Emê wan bi saxî têxin qefesê. Qefesek hûrçavik çêdibe, sofî hezar mişkî dixe hun-dirê wê û derî li wan digre. Rojekê dudwan, sisyan mişk birçî di-bin, dest bi xwarina hev dikin. Pêşî yên biçük, yên pîr û nexweş têن xwarin. Hin bi hin mişk kêm dibin. Carna sofî piçek xwarin davêje nav wan, mişk li hewa hiltînin. Lê wextek tê ku mişk nema xwarina ji derve tê dixwin, lê ku sofî mişkekî ji derve diküje û davêje nav wan bi carekê xwe davêjinê û dixwin. Sofî dinêre ku mişk elimîn xwarina goştên hev, devê qefesê vedike, ji hezar mişkî 40-50 mane, lê ketine tebiêtê pisikan, bi carekê dikevin nav bajêr. Mişkên mayîn ji wan narevin, dibêن qey mişk in, lê ew bi tebiêt bûne pisik û bi vî hawî dikevin nav mişkên bajêr bi ca-rekê diqeşînin.

Çıqas ez xeyala xwe didim dîroka Kurdan, ji dema xelîfên Emewiyan, Ebasiyan, Selçûkî-û Osmaniyan tim ev dek li Kurdan kirine. Em elimandibûn xwarina hev. Weke min li jor ji got acızbûna Türk Freb-û Eceman ev e, ku em nema hevdû dixwin.



**G**elo kar û xwendin herdû bi hev re dibil, mirovek hem kare kar bike û hem jî di wextê kar de kare bixwîne? belê. Keçen Kurdan di ber karê xwe re xwendina xwe jî naşemirînin. Lewra şert ci-qasî dijwar dibil, barê aborî û zordariyê çiqasî giran dibe bila bibe bê xwendin nabe. Cahil û nexwende mayîn ji xezaniyê jî malkambaxtir e.



Ez çûme Dîyarbekirê dikana hevalê xwe, min mîyekir li pişt min qîje qîja tûtiyân tê, min ji xwedîyê wan pîrskir, tûtiyên te cîma qîje qîje dikin. Perwendekarê tûtiyân bersîva min da "keko tûti jî cilê ser te qîje qîje dikin, lewra cilê ser te ê leşkerê Tirkâ ye" Polis û lesker, ji ber kû li vira qaset û pirtûkan qedexe dikin û erîşî zarokên Kur-dan dikin, nava tûtiyê min ji qetandine. Lewra polis têñ bi tûtiyên min re mijûl dibin, tûti dike qîje qîj, bersîva polisan nade û berê xwe ji wan diguherîne, ji ber ku tûtiyên min bi zimanê Tirkî nizanîn, loma ez b. zimanê Kurdi perwendiya wan dikim.

## REJMARAH DERKE

Li ser otomomî hevpeyvînek bi Selîm Silîoa Polis re

# 'Otonomîzm garantiya jiyana rejîmêna faşîst e'

Ji sala 1962 û virde li Başûrê Kurdistanê otomomîst hene. Ew mîjî, li derve hate avakirin û tro jî riya şoreşê digre!

Qala hilbijartînê, li Başûr dîkin. Ew ji bo berde-wambûna axatiya wan û parastina sudênen emperyalîstan e. Heya ku çend Helebçeyê din çênebe, wiha xwîyanî dike ku dê ev reformîst û paşverû ji kar ne kevin.

Selîm 42 salî ye. Ew bi eslê xwe Asur-e. Li Enkawa ji da-yika xwe bûye. Weke kesek şoreşger, xortaniya xwe tev di ser de derbas kir, li hember rejîma İraq û oportûnîzma hêzên çep yên Ereb û reformîstêni mintiqê. Niha kovara "Ahrar al İraq (İraqa azad)" derdixînin û Ahrar al İraq her ku wir ve diçe xwendanen xwe zêde dike.

-Otonomî ci ye an jî ci tîne bîra mirov?

-Eger em bixwazin tiştekî li ser otonomiyê bêjin, pêwîst e em li ser van bisekinin ka, bermameyêni (program) wan ci nin û kê ev program ji wan re amade kir. Ev kesen ku niha serê govendê (otomomîst) dikşînin kî bûn, çawa bûn û idolojiya wan ci ye. Ji aliye din jî pêwîst e li ser tecruba otomomîzmê bête sekinandin, ku xwîna mîlyonan kes ji Kurd û derveyî Kurd dane ni-jandin û qare qarê şehîdan e...

Programa otonomîzmê ji serif ve ji teref Ingîlîstan hate çêkirin û tro bûye dûvikê welatîn emperyalîst. Heroj li ser masayêni faşîstan e. Bi pratîkîn xwe, rî li hêzên mintiqê yên şoreşger digrin. Li ser ci esasî diçin bi van welatan re rûdînin an jî bi dehan sal in bi zora xwe li ser xelkê, axatiyê dîkin...

Ji xwe re kirine program, gava şoress bi ser dikeve û zora dagirkêran diçe, ew dibêjin ji xeynî otonomiyê me tiştek din navê. Yanî agirê şoressê divemirînin û dicemidînin. Pişî ku xelk cemidî, vê carê dagirkêr bi hêz dibin û xelkê diperçiqînin. Îca dîkin hawar, dibîn "demokrasî" an jî "heqênen me dixwin". Yanî otomomîst xelkê bi destêne xwe dikujin û diçin li ser yên kuştî digrin. Kesî polîskayek wilo ku bi xwe re ketiye îxanetê, ne dîtiye. Polîtiqa wan bi tevayîf îxanet e.

-Niha tiştek aktuel heye. Dibêjin bi hilbijartîna başûrê Kurdistan ku di bin kontrola cephâ Kurdistanâ İraq de çê dibê, dê demokrasî were mintiqê. Hûn ci dibêjin, ew dikarin li wir dezgehek wilo ava bikin?

-Bi rastî ew kesen wiha dibêjin haya wan ji dîrokê û tecruba otonomiyê tune ye.



En li pey otomiyê digerin dê nikarîbin gele xwe ji koçberî, rebensî û xezaniyê rizgar bikin



Bê pay in. Ew kesen di nava cephe bi xwe de, bi dehan car hevudin derewîn, sextekar û dizek derxistine. Di nav xwe de jiyanê perce perce dijîn. Hinek ji wan her roj li ser masa Şah bûn û hinek li ser ya Saddam û hinek jî ya Tirkîyê. Di riya Emerîka de wan şikal qetandin. Her roj li Ingîlîstan û li welatîn din in û ji axayê xwe aqil digrin. Gelo, ew dê demokrasiyê, ji tecruben birakuji, dizitî anjî dê ji faşîzma Tirkîyê bînîn, em meraq dîkin! Bînahiya ku bi destêne wan ava bibê, bê esas e (binax e) û mahkumê ketinê ye. Em weke Marksistî İraqî van kesan mahkum dîkin. Pêwîst e tev bêne dadgehki-rin. Ez bawer im xelkê mintiqê, wê wana di dadgeha gelî de muhakeme bike.

-Li bakûrê Kurdistan PKK diyar kir ku hilbijartîn dê çêbibê û parlamento ya neteweyî dê bête danîn. Ji aliye din ve li başûrê Kurdistan ji hilbijartîn tê xwîyanîkirin. Li cem we, di navbeyna herdu hilbijartînan de ci ferq heye?

-Cepha Kurdistan niha perda dawîn ya şano (tiyat-ro) dileyize. Hilbijartîn, tîne holê. Bi taybetî serik-leystikvan Mesut Barzanî ye. Ji beyanê wf ku li derveyî welat dane û di van mehan de li gel hin welatan rûniştiye, xwîyanî dike ku, dixwaze rî li hareketen şoresser bigre. Wiha xwîyanî dike ku ew, ji bo berde-wambûna axatiya xwe, dikare hemû kesî bifroşê û derxîne bazarê. Hilbijartîna Başûr şiklî ye. Hilbijartîna li Bakûr gavek mezin e ji bo rizgarbûna mintiqê, ji awira perçiqandina rejîmêna faşîst û hêzên paşverû û axayê wan ku alîkariyan didine wan.

-Hûn dikarin dîtina xwe li ser Tirkîye bibêjin. Hinek kes dibêjin demokrasî li wir bi pêş dikeve. Dîtina we ci ye?

-Tişten ku ez dizanim û haya min ji wateya demokrasî heye, ez dikarin bêjim ku, rejîma Tirkîye ya niha ji ya hemû demî hovtir e.

Dijminê gelê xwe û gelên mintiqê ye.

Qetîfamkirina xelkê bi hemû cûreyen çekan li Tirkîyê berde-wam e, heqênen miravatî tune ye, heps dagirtîne, rûşvet heye, talankirina kulturî heye, qanûn polîsên taybetî bi xwe ye, hêzên ji derve an jî yên reş, Tirkîyê idare dîkin.

*Hevpeyvîn: Gulay Çiyan*

Destana Memê Alan û Nureddîn Zaza:

# Dîroka nivîsandina destana Memê Alan



## Koyo Berz

Ji çiyayên Dêrsimê bigrin heya Loristanê Memê Alan, ji Mehabadê bigrin heya Diyarbekirê, ji Suleymaniye bigrin heya Qamişlo yê, ji Sêwregê bigrin heya Kerkükê û li her derêne Kurdistanê destana Memê Alan tê gotin û bi nav û deng e. Zarok û xort, kal û pîr, jin û mîr hemû gelê Kurd, di rojê xwe yên vala de, cejn û roşanan (éyd) de, dawet û şahiyan de û şevê zivistanê de, li dora dengbêjan kom dibin û bi satan lal û kerr, bi heyecan û heyran guhdarêne vê stran û çirokê dibin.

Bi şev û rojan dengbêj distirin, lê mixabin nikarin dawiya destanê (stranê) bînin. Dengbêj çiqas distire ewqas jî guhdar lê guhdar dibin. Wext dibe du-sê dengbêj ji devên hev digrin û distirin.

Çiroka Memê Alan bi saya dengbêjan gihaye vê rojê, vê merxelê û bi saya wan ji bîr nebûye û têk neçûye.

Em çiqas sipas bikin hindik e ji bo dengbêjê me yên giranbuha û hêja. Destana Memê alan çiqas di nav Kurdish de belav bûye, wisa jî di

nav Ewrûpî û biyaniyan de qîmet girtiye.

Ewrûpiyan berî me qîmeta destana Memê Alan naskirine û lez dane xwe ku vê destana evîneke pak û bilind, bi laş û bi gewdebûna rûçikên gelê Kurd, berztir bixîne pêş xwendevanen xwe.

Rojhelatnasen Ewrûpî ku bi "Memê Alan" mijûl bûne çendek in: Berî gişan A. Sozen (A. Socin) di sala 1890 an de, li Petresburgê (nihâ Lenîngrad), bi Almanî û bi zaravayê Botanî ev destana Memê Alan nivîsiye û li Ewrûpâye belav kiriye. Pişti wî A. Von le Coq li Almanya yê di sala 1903 an de Memê Alanekî din çap kiriye.

Di nav salen 1906-1909 an de Almanekî din bi navê Oscar Mann li Berlinê, bi zarê Mukîf û bi Almanî tevî çend çirokên Kurdi yên din, wek "Xan Dimdim" Memê Alan daye çapê û ew xistiye ber çavên gelê xwe.

Kurdnasekî din, bi navê Hugo Makas di sala 1926 an de li Lenîngradê dîsa Memê Alan pêşberî xwendevanen Ewrûpî kiriye.

Di sala 1936 an de, li Erivanê çend Ermeniyê Kur-

dîzan jî 3 guhartokên Memê Alan bi Kurdi çap kiriye.

Piştire, dawiya gişan, di sala 1942 an de Kurdiñasekî Fîransiz Roger Lescot pişti xebata 4 salan, bi alîkariya rehmetî Mîr Celadet Bedîrxan, Memê Alan digel wergera wê bi Fîransizî, li Beyrûtê çap kiriye.

Ev kitêb di nav Kurdish de belav nebûye û bi tenê li cem çend kesan peyda dibe.

Ji bo bi destxistina vê çîrokê Leskot guhdarê bêtif 20 dengbêjan kiriye.

Yekî ji wan bi temamî, ew ji ber ne dizanî.

Ji ber ku, her wekî Leskot bi xwe dibêje, bi windabûna emîr, axa, beg, şex û mezinê Kurdish, dengbêjên hêja ji holê radibin û cihê wan vala dimîne.

Eger ji îro şûnde em guh nedîn folklor xwe, wê winda bibe û here.

Divê em folklor xwe ya gelek dewlemed nas bikin, stran, çirok, destan, fiqre û esaneyen xwe yên gelêri bici-vînîn, binivîsîn û bidin çapê. Ji bo ku winda nebin û têk neçin. Em hêvîdar in ku destanen me yên wekî Memê Alan di xwendegeh û zanîngehîn me de bîn xwendin û tefsîr kiri.

Destana Memê Alan cara pêşîn di sala 1957 an de bi dizî li Şamî hatiye çap kiri û dîsa bi dizî di nav hin Kurdish de belav bûye.

Ev destana Memê Alan, ji alî Rehmetî Dr. Nûreddîn Zaza ve, bi şîklê îro û bi Kurdiyek paqij hatiye nivîsandin. Lî mixabin dijminê neyar û bêbext nehiştiye ev destan di destê gelê Kurd keve.

Ew ên ku destan di mala wan de dîtine, birine avêtine zindanê, işkence kirine û kitêb şewitandine.

Di sala 1973 an de ev destan ji alî weşanen Bahoz, nuh ve hatiye çap kiri û di nav Kurdish de belav bûye.

Em gelek sipas dîkin, ji nîvîskarê mezin Dr. Nûreddîn Zaza re, ku ev destana bi qedir û qîmet nivîsandiye û gi-handîye destan xwendevanen xwe û gelê Kurd.

Em gelek sipas dîkin, ji weşanen Bahoz re, ku wan jî ev destan ji nuh ve çap kirine û di nav gelê xwe de belav kiriye.

Bi rastî jî destana Memê Alan, ji mirov re bedelê malê dinê ye.

Wexta ku mirov guhdarî li stranê dike, mirov ji xwe derbas dibe, kela dilê mirov dikele, kezeba mirov hem dişewite hem jî hênik dibe.

## Folklor Botan -7

### 7- Stiranên Henekan

Ev babet ji bo ken û gewz (keyf) û xweşiyê ye. Bi xwe peste ye û awaza wê ji okta-vekê (8 deng) kêmîtir e. Stirandina wê jî taybetî ye û car-na dengbêj dipeyiye û dengê xwe diquhere. Wisan bi den-gekî zelal û bi ken û henekan ji aliyê kur û mîran ve tête stirandin û naveroka wê jî:

1- Xwesû û kesen pir hişk û nezan

2- Firinde û dirinde

3- Dîndarênen sitemkar û xapînok

4- Kar û tiştên seyr (ecêb)

5- Rexne

6- Kesen ku ha ji xwe nînin û pûte (iftîmam) bi xwe na-din.

7- Li ser xwestina he-nekbêjî û...

Ev naverok di gel stiranîn bûne pînasa stiranên Henekan û bê şerm di gel peyvîn seyr tête pêşkêkirin.

Ev babet (mewzû) heya îro jî li gundan maye û ji bo çejê (tamê) carna li bajaran jî tête bihîstîn. Lî cihê dax û mixa-binê ye ku li Radyo, Televizyon û kasêtan kêm hatiye parastin. Û hemû li ser dengbêjî dimînê, yê ku her gîz (qet) naxwazê bistire û yan ji wî ve xwekêmkirin e, yan belku ji

### Hew...

#### 2- Miho dawo

Tîrna nîne, tîrna nîne Tîrna nîne Miho dawo Gotna wê li welêt na mîne Tîrna nîne Miho dawo Şûra Mihoy gije gije Tîrna nîne Miho dawo Ev sebab e makerkuj e Tîrna nîne Miho dawo û...


### 3- Xwesû

Êlê lo, maşalla yar xwesuwê xwesuwê û...  
Êlê lo, maşalla xwezi xwesû nebanda  
Êlê lo, maşalla bûk bi dilê xwe bana  
Êlê lo, maşalla xwesû bibne koxêyo  
Êlê lo, maşalla lêkin cilkên kerêyo û...



# Zilamek û zimanek

C E L A D E T A L İ B E D İ R X A N



'Kurdino, eve zilamek û zimanek  
û tiştê ku bi vêna (îrada)  
zilamekî tête pê. Di kar û  
biserhatiya vî zilamî de pend û  
derseke mezin heye. Herçî  
miletên bindest û bêziman an bê  
zimanê nivîskî ne divêt jê ibretê  
bigirin. Herçî em Kurd, me ziman,  
me zimanekî delal heye  
û em pê daxêvin û piraniya me ji vî  
zimanî pê ve bi tu zimanî  
nizanin. Bi tenê divêt em hînî  
xwendin û nivîsandina zimanê  
xwe bibin.'

*Maqala jêrîn ya ku Celadet Ali Bedirxan, bi nasnavê Herkol Ezîzan di Hawar'ê de belav kiribû, em ji bo xwendanen xwe carek din belav dikin.*

Belê heke ew zilamê xwirtû bi vêneyd bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mîrî vejîne. Herwekî emê niha bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mîrî vejandîye û ew xistiye nav zimanen zîndî, nav wan zimanen ku mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê eşkere dikin.

Me got zimanen mîrî zimanen zîndî. Bêdiro, ji awîra jiyanbaryê ve ziman jî wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijîn û dimirin.

Ji zimanen mîrî hin hene warkor û kordûnde diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêlin; ne kîl ne kitêb. Hinê din di pey xwe re, eserine mezin, kitêbine hêja dihêlin û ew kitêb hetanî iro jî têne xwendin. Lê, ew ziman bi xwe mîrî ne, ji ber ku êdî ew ne zimanen devkî ne û tu kes bi wan naçeyîve.

Li Ewrûpayê, latînî, li rohelatê nizing, îbranî zimanine mîrî bûn. Latînî iro zimanekî mîrî ye. Lê herçî îbranî êdî ne zimanekî mîrî, lê belê zimanekî zîndî ye.

Belê ew mirov bivêni nav cihûyan de derket û zimanen îbranî vejand. Îbranî zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalîs ê erebî ye. Tewrat yek ji çar kitêbîn mezin pê hatiye gotin û nivisandin. Bi tenê zanayan pê dizanî û di kiniştan de tewrat bi vî zimanî dihate xwendin.

Herçî cihû bi zimanine din, bi zimanen welatê ku tê de rûdînîştin xeber didan. Yanî cihûyan zimanekî mîrî, zima-

nekî xweser nîn bû û ji lewre wan bi zimanen xelkê xeber didan.

Di sala 1877 an di şerê Ûrûs û tirkî de zora tirkan çû bû û herçî miletên Belqanê hene jî bindestiya tirkan xelas bû bûn. Xelaskirina dewletên Belqanê nemaze bi destê Çarê Ûrûs çû bû serî û miletê Ûrûs bi xwe bi vî îşî bendawar dibû û rojnameyên rûsî gelek qala dewletên Belqanê ên nuh dikir.

Di welatê Ûrûs de xortekî cihû bi navê Elyêzer bin Yahûdî hebû. Kurê Yehûdî wek herkesi bi vî serî bendar war dibû û didît ku miletên bindest wek ên Sirbistan û Bilxarîstanê û ên mayîn ji nîrê zorkerên xwe xelas dibûn û digîhaştin fîstiqalân xwe. Yehûda bi van bûyeran li miliyeta xwe hîşyar dibû û li ber halê miletê xwe diket. Yehûda didît ku halê miletê wî ji halê her miletê din xirabtir e. Cihû ne bi tenê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanen wan jî, nîne û bi zimanen xelkê xeber didin.

Kortê cihû querara xwe da û di dilê xwe de got: divêt cihû vegerin welatê pêşiyen xwe, welatê kurên Îsraîl, û dîsan divêt ku cihûyan jî weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin. Ew ziman jî zimanen pêşiyen, zimanen îbranî ye.

Yehûdî hînî zimanen xwe bû û di sala 1878 an de qesta Parîsê, qesta wî bajare mîvanhewîn kir.

Li Parîsê, Elyêzer bin Yehûda têkilî cihûyan Parîse bû. Elyêzer ji alîkî zimanen xwe pêş ve dibr û jî aliyê din fîkrîn xwe ên mîlî belav dikirin. Lê welatiyên wî bi xwe lê radibûn û heye ku digotin ew mirov dîn e. Lê Yehûda guh

ne dida wan û ji eser xwe a mezin re bi vêneke xurî û mezin û bi serê xwe dixebeit. Yehûda kiri bû serê xwe ji miletê xwe ê bêziman miletekî biziman bîne pê.

Yehûda bixwe hînî zimanen xwe, hînî îbranîyê bû bû. Niho diviya bû îbranîyê di nav cîvata miletê xwe de belav bike. Ji bo çandina tovê xwe jê re zeviyek diviya bû. Di sala 1881 û de Elyêzer keça mamosteyê xwe ji xwe re anî û berê xwe da Filistînê. bi vî awayî jînikek, hîmî xanimanekî, keti bû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rî ve, di vapore de dersa jîna xwe got û hetanî ku gihaştîne erdê Filistînê jîna wî hînî çend pirsên îbranî bû bû.

Gava pê li erdê pêşiyen kîrin Yehûda gote jîna xwe, ji niha û pê de emê bi tenê bi îbranî xeber bidin. Îbranîya jînikek gelek hindik bû. Jînikek kir ne kir lê mîrê wê ji qerara xwe ne ve geriya. Ne hewceyî gotinê ye ku zaroyen Yehûda hetanî ku bûne xort ji îbranîyê pê ve bi tu zimanen ne dizanî û ji lewre di nav xelkê de lal dihatine hesêb. Lê bi vê taliyê miletê cihû wek milete din bû xwedîyê zîmenekî, xwedîyê zimanekî xweser.

Yehûda û xelkê mala wî di zivariyê de dijîn. Lê ci xem. Ji fîkirine mezin re fedekarîne mezin divêtin. Ji ber ku xelk bi derbekî bîra fîkîra mezin nabe. Yehûda nanê tîsî dixwar lê gava didîd ku xelkê mala wî bi îbranî xeber dida, bawer bikin, xwe bextiyartîre mirov dînyayê dihesiband.

Dawiyê Yehûda rojnameke bi îbranî belav kir û ji xwe re xwendanen jî peyda kirin.

Ji milê din Yehûda ferhen ga miletê xwe çedîkir û bêjeyen ku di zimanekî mîrî

## PÊNÛS

Amed Tigrîs



### Kerên me di axurên xelkê de dizirin

Bî salan in, ku pirs û rewşa dengbêjan bala min dikişîne. Min çewt fam nekin, ez ji dengbêjîn me re nabêjim. Ew ronya herdu çavên min in. Bibikên min in. Lê ez ji wan dengbêjîn ku bi esil û feslîn xwe ve kurd in û bi tirkî dibêjîn behs dikim. Yanî bi tirkî "Türk halk müziği sanatçuları" re dibêjîm. Ew kurdîn ku müzik, awaz, meqam. Û gotinê me digirin û dîkin tirkî. Di radyo, televîzyon, şano (sahne), kaset û sâlikan (plaçan) de, bi tirkî distirin. Stranen me yê dewlemed û xweş dîkin tirkî. Ji bo pere dibin aleten asîmîlasyonê. Bi kultura Kurdî re, xwe û dengê xwe difroşin.

Dinya hemû pê dizane ku caşen Kurdan bi nav û deng in. Caş ji gündan in û li gündan in. Gundan diparêzin (!) Dema caş û lesker hebin divê bavê wan jî hebin? Ma qey ew ne bê bav in. Bavê caşan ker e. Lê, dewletê bi politika xwe ya parvekar destê bav û lawan ji hevdû kiriye. Caşan li gündan bi cih kiriye û bavê wan ên ker jî, li bajaran. Ji ber vê yekê, mirov ker û caşan bi hevdû re nabîne. Ev jî qedera bav û lawan e. Ma em ci bikin?

Wek caş, ev ker jî kerên me ne. Ew di mîrgîn me de dicîrin. Ava kanî û newalîn me vedixwin, lê di axurên xelkê de dizirin.

Wek tê zanîn kalê keran Celal Sesigüzelî Dîyarbekirî bû. Wî li ber axur û deriyen dagirkeran cara pêşî dest bi zirê kiribû. Lî iro ker û caş pirr bûne. Wekî Ibrahim Tatîses, Izet Altınmeşe, Atakan Çelik, Küçük Emrah, Burhan Çaçan û hwd... Çiqas ka û cehênen wan zêde dîkin hewqas ew hêc û har dibin û dizirin. Dizirin û dizirin.... Zitikan didin.

Çend roj berê min di televîzyona Tirkî de temaşa Izet Altınmeşe kir. Wî strana "Leyla" ku Aramî Tigrîn dibêjî kiriye bi tirkî. Di stranê de "Leyla" Leyla Qasim e. Dema min guhdariya Izet Altınmeşe kir, min xwe negir û televîzyon girt. Bi rastî hewqas jî îxanetî û xwefiroşî nabe.

"Dema canê ker dixwire ew kotekî dixwaze û wê demê dizi-re." Tê gotin, ku buhuştâ (ceneta) keran gevzik e. Bi despêka bi harê re zira keran pirr tê û her ku diçe zêde dibe. Kerno, ka em binîrin, hûn dê heta çend biharîn din jî bikarîbin bizirin!

de nînin ew ji pêk ve tanîn. Zimanen îbranî jî di nav cihûyan de belav dibû. Di sala 1922 an de gava Elyêzer bîn Yehûda mir, zimanen îbranî yê ku berî 30-40 salî zimanekî mîrî bû, bû bû zimanen miletekî. Ev ziman fro di Filistînê û di rex erebî û îngîlîziyê de zimanekî resmî, zimanen dewlet û hikûmete ye jî.

Kurdino, eve zilamek û zimanek û tiştê ku bi vêna (îrada) zilamekî tête pê. Di kar û biserhatiya vî zilamî de pend û derseke mezin heye. Herçî miletên bindest û bêziman an bê zimanen nivîskî ne divêt jê ibretê bigirin. Herçî em Kurd, me ziman, me zimanekî delal heye û em pê daxêvin û piraniya me ji vî zimanen pê ve bi tu zimanen nizanin. Bi tenê divêt em hînî xwendin û nivîsandina zimanen xwe bibin. İro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanen mader (zîmkarî) ji bo her miletî edî ne bi tenê wez lîfeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfe ranebûne wezîfa xwe a milî pêk ve ne anfîne û bi kîrî miletê xwe ne hatine. Ji bona ku mirov bikare xwe ji milete-

kî bihesibîne divêt bi kîrî wî bêt. Pişî ku em kurd jî wek miletên din bûne xwedîyê el-fabeke xweser, xwendin û nivîsandina zimanen me gelek hîsanî bûye. Tecrûbê şanî daye ku li gora jîriya mirov kurd ji heftekî heta çar heftan de dikarin hînî xwendin û nivîsandina zimanen xwe bibin.

Belê piraniya kurdan bi tenê bi zimanen xwe ê mader dizanîn û ji lewre li mal be li derve be bi tenê bi kurdî dipeyivin. Lî di nav kurdan de hindikahîke kiçik heye û xelkê vê hindikahîye an di welatê xeribiyê de bûne an fro tê de dijîn. Tiştê ku ji vê hindikahîye re divêt, heke bi zimanen xwe nizanin berî ewîl hînî wî bibin û piştre di nav mala xwe û bi zar û zêçen xwe re herwekî Elyêzer dikir bi tenê bi kurdî xeber bidin.

Belê ji van Kurdan re divêt, gava ji derve têne mal, herwekî cilêن xwe ji xwe di kin û wan bi cilêن malê di guherîn, zimanen xwe ji welê bi cilêن malê di guherîn, zimanen kuçê di nav malê de naxêvin û zimanen malê, zimanen mader wek tiştekî miqades hilşin.

Di salvegera bîranîna şâîrê bi rêz de em dibêjin:

# Mamoste Hêmin di dilê gelê Kurd de diji

## Gabar Çiyan

Zimanê Kurd û Kurdistan, evîndarê ala rengîn, mirovê bi şeref û bi namûs û şexsiye ta bilind û bi rûmet û Kurdistani, Mamoste Hêmin, di Nîsana sala 1986 an de ji nav me koç kir.

Mirov dikare li ser humera wî gelek tiştan bêje û bîne zimên. Lî em vê yekê nakin; emê li ser jiyana wî hinekî bisekinin û çend ji helbesten wî pêşkêşî we bikin. Dê hûnê bibin ku bi rastî, di her rêzekî wî de, bêhna Kurdayetiyê, Kurd û Kurdistan û rewşa welat xwîyanî dike.

Mamoste Hêmin di sala 1921 an de li rojhilata Kurdistan ji dayika xwe bûye. Navê bavê wî Seyid Hesenî û dayika wî jî Zeyneb bû.

Xwendin û nivîsandinê li dibistanê li cem Mamoste Seîd fêr dike. Dûre li bajarê Seblax diçe kutupxaneya Sadet û li wir 4 salan perwerde dibîne, fêr zimanê farisî jî dibe. Pişti Seblax, derbasî bajarê Xaneqa dibe. Li wir jî li ber destê rewşenbîren Kurd Mele Ehmedî fewzî û Mele Silêmanî nêzî 4 çar salên din jî dersên piralî dibîne û li ser edeb û kultura Kurdî bi pêş dikeve. Di wan salan de klasikîn Kurdî piralî dixwîne.

Pişte nav û dengê wî li

Kurdistan belav dibe û Mamoste Hêmin, tevlî karê ramyarî dibe. Di sala 1943 an de, di avakirina rêkxistina Komeley jiyanewey Kurdistan roleki mezin dileyize. Di wan deman de bi taybetî di kovara rêkxistinê ya navendî de (Nîstiman) piralî dixebeite. Paşê ji bo ku PDK-ê ava bike dikeve kar û xebatê. Di sala 1945 an de li deverên vekirî li Mehabetê şîfrîn xwe dixwîne û xelkê coş dike. Di dema avakirina Komara Mehabet de di karê ragihandinî û weşanî de, berpirsiyariyan digre ser xwe û bi welatperwîriyeke mezin bi karê xwe ve radibê. Di wan deman de kovarê "Hawarî Kurd, Hawarî niştiman, Gir û galî, Mindalan" derdiket.

Pişti Komara Mehabet derbasî başûrê Kurdistan dibe û demekê li wir dimîne û paşê tê Mehabetê. Li wir mîna şâîrê neteweyî tê bi navdarîkin. Di sala Nîsana 1986 an de çavên xwe li jîyanê digre û diçê ser heqîya xwe.

Gerçi tûşî renceroyî û Hesret û derd im emin, Qet le dest ew çerxe siple nabezim  
Merd im emin!  
Min le zincîr û tenaf û Dar û bend bakim niye Letlet im, ken, bimkujin  
Hêsta dekêm Kurdim  
emin

Koxlefi bawî nemawe  
Kîjî kurdfî xoşewîst  
Rapere heste le xew  
Axir çi wextî xewtine  
Derke bîşkene, peçe  
bidêrêne  
rake medrese  
çarî derdî Kurdevarî  
Xwêndin her xwêndin e.

Le şaeî de le wextî helpe  
Le xoşî da le katî pêkanîna  
Le korî matem û giyan û  
Em in ey niştiman tim her  
Le kiwêstanê demî rewşî  
Le mezrayê ke xom helkird  
Le cêjiwanê ke deguşim  
memkî yarê  
Em in ey niştiman tim her  
le bîr e

Bot nûsîbum, bot binusim  
emin çim?  
dundî qendîl, gorepanî hel-  
gurd nîm  
berew berzayî deçim, her-  
çende wîrdî  
Xakî perpêy, tekoşerekî  
Kurd im.

Belê sexte yekcar sext e  
Belam le jîn xoşewîsttir  
Durî le jîn, nemiradî  
Le lay min eto'y azadî  
emin

## Folklorê dimilkî ra:

# 'Dîyarbekiro Xopano' û 'Ez Çizviz Nêzano'

## J. Espan

"Dîyarbekir Xopano" û "Ez Çizviz Nêzano" namey di kitabandê Azad Dilêr o. Azad Dilêr Sêwregi ra wo û Almanyâ di roşeno (nişeno ro). Ma derheqdê Azad Dilêr di sewbî çî nêzanê.

"Dîyarbekiro Xopano" kitabê Azad Dilêr verên o. No

perrê kitabê bi resiman ameyî xemelnayîş. Nê resiman yew resmî Neco (Necmettin Buylukaya) yo. Azad Dilêr kitabdê xwi rê hîrê ripperî vatişê vernî (onsoz) nuşto. Nuştox (yazar) yew cadê vatişdê vernî di qandê xebata kulturî di wina nuseno: "Ewro ala rengîn karda pawey ma. Ma zî gerek (gânî) kulturiya tenya nêmanê, qandê serxwebûnda welatê xuya (xoya) bixeftiye ew xebat bikerê. Kultur û zuwan (ziwan) leteyêndê serxwebûn o. Serxwebûn nêbo se, ziwan zî, kultur zî tamê ci çinî yo."

"Dîyarbekiro Xopano" 30 helbest (şîür) yan zî deyîran amewo meydan. Kitab heme bi şîwa Sêwregi nusîyawo. Ebi nuştişê nê kitabê, Azad Dilêr yew kardo gelek baş kerdo. Bi nê kitabê yew qismê folklorê ma vinîbiyayîş ra xelesawo. Heta bîni ra zî bi na xebati, hem wendoxê (okuyucular) û hem zî ziwanzanayey do şîwa Sêwregi hina weş bişinasî.

Ma vernî di zî vatibi ki no kitab, kitabê nuştoxê verên o. Zey hergû kardê verênî, tayn arê kerdi. Hewnaçimay deyîran nênewito.

"Ez Çizviz Nêzano" kitabê

AZAD DILER

Dîyarbekiro Xopano



kitab 1986 di Almanyaya Rojawian di çapi ro gunawo. Kitab pêrû 60 riperr o. Hewt ri-

# AZADÎ

Abdurahman Durre



## Giliyê daran

**G**iliyê daran navê çirokeke ji donzde çirokên "Mamê Hîto" ne, Ku Fehmî Bilalî Licê, katibê Şêx Seîd Efendîyê şehîd, ewan çirokan digotin.

Fehmî Bilal, zaniyarek (alim û filozofek) pirr mezin û pirr bi rûmet bûye, yek ji aşiqen Şêx Seîd Efendî bûye. (rehmeta xweda li ser wan be, canê wanê eziz pîroz be, bereketa wan li ser me be.) Zimanê firansizî pirr rind zanibûye, çawan ku Melîk Fîrat (nebiyî Şêx Seîd Efendî) digot, Fehmî Bilal, pişti ku ji sîrgûnê fertîlî welat, di navbera sala 1954-1957 an de, dersa 'Felsefe, Edebiyat û Tarîxê da me û pirr tişt hînê me kir.

Çiroka giliyê daran bi kurtî wiha ye:

Dibênu ku dareke pirr mezin û kevnare tevrekî (bivirekî) dibîne, jê re dibêje, hey tevrî bê wîcîdan û zalim, tu çîma daran dibîr, em dar pirr bi kér û bér in, em nahêlin ku lehî xwîliyê bişo û biherikîne, erdê qirac bîhèle. Em bi siya xwe û fêkiyêne xwe û bi belg û şaxên xwe, ji mirovan re xizmet dîkin, her der û waran xweş dîkin, kesk û hêşin dîkin. Bi her awahî bi kérî însan û heywanan tê, hûn bîvirên bê şeref û bê wîcîdan çîma me dibîrin, çîma bê însafî û xedariyê dîkin. Bîvir ji darê re wiha dibêje:

Ez qewetê ji te dîgrim  
serê te bi destê te dibîrim

Ku te neda min destbîvir  
ha, ez û ha, ev kevir

Yanê ku destikê min ji te neba, ferqa min û kevir tunebû, min tu tişt nedîkarî ku bi te bikim.

Melîk Efendî digot: Ku Fehmî Bilal, ev çirok wiha şîrove dîkir (tebîr dîkir), digot dar, gelê Kurd û Kurdistan e, bîvir jî dijmînê wan e, çawa ku bîvir destikê xwe ji darê distîne û darê dibire, dijmînê Kurd jî bi desteka caş û xayînê Kurdan, gelê Kurd dibîrin û qîr dîkin.

Ev mesela Kurdan e derdê li ser derdan e  
Hîndek heramzadê wan nankor û ewlîdê wan

Jî beganan ra dibîn destegîr û piştegîr  
Jî bo wan xizmet dîkin Kurdan dixîn binê nîr

Şerm û fedî qet nakin wan caşîkên bê fedî  
jî bo dijmînan çak in, welat lê nabin xwedî

Bê xîretê bê îman bê şerefê bê namûs  
Naşewîte pozê wan bîmrin ew elk û kabûs

Bîmrin qeşmerê bî şîr bijîn şoreşgerên jîr  
Bîmrin segur û beraz bijîn şêrê serefraz

Bijî Kurdistana min bîmrî neyar û dijmîn

Azad Dilêrî diyin o. No kitab, Enstituya Kurdan şaxê Almanyâ 1987 di çap kerdo. Kitab Azad Dilêr nuşto û Derwês Welî zî redakte kerdo. Azad Dilêr û Derwês Welî piya kitabê rî vatişê vernî nuşto. Ebi gore bê vatişê vernî, nuştoxan no kitab qandê gedan (qican, domanan) hadire kerdo. No kitab zî zey "Dîyarbekiro Xopano" bi şîwa Sêwregi amewo nuştiş. Nuştoxan ebi gore bê hergû estanik (şaniki) yan zî mesela resimî zî day vîraştiş.

Bi vatiş bê nuştoxan, kitab hîrê letey o. Letewo verên di estanikê dewda Azadî kom kerdi. Letey diyin di estanik yan zî meseley ki Azadî eşna-wî nuşti. Hîrê estanik Oskar Mann zî letey hîrin di esti. Oskar Mann nê estanikî 80 Serrî ra ver dormarey (çorsmey) Sewregî di arê kerdbî. Di helbestê ki no kitabi dir i, ma nêzanî Azad Dilêr bixo nuşti yan zî arê kerdi. Nuştoxî na mesela zî zelal nêkerda. Helbesta bi name bê "Ding Ding" ez vana qey folklorik a. Helbesta diyina ki bi name bê "Newroz Yeno" helbesta Azadî bixo ya.

"Ez Çizviz Nêzano" folklorê mayê delal ra yew numûnedo weş o. Eki gedey ma kitabê xalê xonê Azadî bîwanî do tira zaf hes bikî. Eşke-ra aseno ki Azad Dilê semedo ki ziwan û kulturê ma aver şero xo gelek dejnawo (tewnawo). Jey dest ra ci amewo texsîr nêkerdo. Boyey welatperwe-rey, nuştanî Azadî ra vîrsena. Ma Azad Dilêrî pîroz kenî!

# Zarokên şoreşê

Ez li ser hêt bûm. Min li ser û berê bajêr mîze dikir. Li binya hêt li aliyê çepê du zarok rûniştibûn, sêzde-çarde sal kiribûn yan ne kîribûn. Li ber hev rûniştibûn û qise diki-rin.

**Zeyd:** Em li malê bi kurdî qise dikan. Li dibistanê bi tirkî. Lê zarokên mamostê me li malê jî li dibistanê jî bi tirkî qise dikan. Yek jî bi kurdî nizane. Em jî tev bi kurdî qise dikan û em bi tirkî nizanin. Lê me bi zimanê tirkî didin xwendin. Gelo em çima bi zimanê xwe naxwînin?

**Murat:** Bi zimanê me nivîsandin nayê kîrin.

**Zeyd:** Tê kîrin. Min di destê bavê xwe de rojnameyek kurdî dît. Bavê min bi zor dixwend. Min wê çaxê lê nêrî. Lê min tu tiş jê fêm nekir.

**Murat:** Mamoste ne ji welatê me ne bi kurdî nizanin. Ji ber vî bi tirkî xwendinê dikan.

**Zeyd:** (destekî xwe hilda û bersîv zû pê ve kir)

- Gelek mamostê me bi kurdî dizanin. Ma xalê min nizane?

**Murat:** (Destê xwe da serê xwe û got)

- Lawo midûr nahêle.

**Zeyd:** (piçkî li çavê Murat nêrî û hinek bi qehir)

- Midûr ji gundê me ye, kurmancê hir e, çima nehêle?

**Murat:** (Wek ku ji rûhê xwe aciz bû. Bi destê rastê lingê Zeyd heliqand aliyê din)

- E çima lawo, ka tu bêj, ka tu bêj?

**Zeyd:** (Bêhna xwe fireh kir û destê xwe bi qamişlo ve kir)

Leşkerên mêtîngaran nahêlin, diben kurdî tûneye, diben welatê

Kurd tuneye. Li Sûrî pismamên me hene ew jî bi erebî dixwînin û dinivîsin.

**Murat:** Ma tu çûyi Qamişlo?

**Zeyd:** Erê. Pismamên me jî carna tê. Peyvîn me wekhev in.

**Murat:** (Hinek qedimî bi teqlîke zanîn)

- Erebî ketiye nav zimanê wan, xwendin û nivîsandina wan bi erebî ye. Televîzyon û radyonê wan jî bi erebî ne. Kurdiya wan xerabûye.

**Zeyd:** (Berê destê xwe da singê xwe)



- A me jî tirkî dikeve nav. Doh bavê min û pêşmergekî rewoker qise dikir. Li Îraqê erebî û li Iranê jî farisî dikeve nav zimanê kurdî.

**Murat:** (Wek mirov henekî xwe bi yekî bîke)

- Tu jî ji ber xwe van tiştan çê dikî. Te ci-rand.

**Zeyd:** (Bi bîr û bâwerî û bi xeber)

- Bergîl, ez derewa nakim. Li Iranê, Îraqê û li sûrî navê gund û bajaran jî qulipandine, li vir jî wilô. Ka navê gundê te ci ye? Çima du navê gund hene?

**Murat:** (Bi dengeke gebe)

- Erê lawo ma li Iranê Kurd hene?

**Zeyd:** (Biqehr di- danê xwe qiriçand)

- Li Rûsyâ jî hene. Welatê me di sala 1639 an de Tirk û Farisan kir du par, di sala 1923 an de jî emperyalîzmê û mêtîngera welat kirine çar par.

**Murat:** (Çavê wî beloq man bi dengekî zirav)

- Mêtîngertî û emperyalîstî ci ye?

**Zeyd:** Tirk û emeri- ka û hevalên wan.

**Murat:** Bavê te ne mele ye profesor e la- wo.

**Zeyd:** Bavê min mele ye, wî hinkî dîrok xwendiyer.

**Murat:** (Wek agir ku şewq vede)

- Ma dîroka kurdî jheye?

**Zeyd:** (Destê xwe da serê xwe)

- Çawa tune. Ezé pîrtûkê pêş te kim. Di pîrtûkê de behsa bindestî û serhildanan dike. Bavê min wê rojê ji me re dixwend.

**Murat:** (Hinek sekînî û weke ku tiştek dît dest bi xeberdanê kir)

- Kurê apê min jî par behsa tişnê wilô dikir. Ew û kalikê min ketin qırka hev. Behsa xelasîyê dikir. Behsa çandê dikir, behsa azadiyê û sosyalîzmê dikir.

**Zeyd:** (Qedimî bi ber Murat)

- Kurê apê te ki ye?

**Murat:** Delîl

**Zeyd:** (Bi meraq)

- Ci bû dûre?

**Murat:** Derketiye çiyê. Niha bi çek digere. A rastî kalikê min jê nexwes bû. Niha wek ku xwe pê mezin dike.

**Zeyd:** (Serê xwe bir û anî)

- Ne esil ku mirov xwe bi wan mezin bîke. Ka mirov zanibe bê ji bo ci çû.

**Murat:** (Hinek bê deng ma)

- Ka birê te ji bo ci

çû?

**Zeyd:** (Çavê xwe xist çavê Murat)

- Ji bo evîn, bîr û bâweriya welat çû. Di go, "ê hez ji welatê xwe neke hez ji tiştekî nake, ji bo wenateke serbix-we û azad bila her tiş feda be."

**Murat:** Te xeber- danê birê xwe jiber kirine.

**Zeyd:** Erê. Ezî riya wî bajom. Roja destê min baş çek bigre eze herim.

**Murat:** (Bi hay hoy)

- Tu karî herî? Tê ji bo ci herî?



hemed bû?

**Murat:** (Bi tirs)

- Em niha kole ne?

**Zeyd:** (Bi dengekî dilgerm)

- Ne wek berê. Berê em li hember hev mîr bûn. Niha em li hember dijmin şîr in. Li ciya şervanê şoreşê hene. Li bajar û gundan, dayîk, bav, kal derdikevin riyan û qasînan sin-ga xwe vedikin ji berekan re.

**Murat:** (Bi dilgermî xeberdan berdewam kir)

- Wê rojê dikandaran dikanê xwe girtin. To-fanik mirov çû ser goristanê. Şervanekî şoreşê şehîd bûbû. Dayîka wî li pêsiya mirovan stran digot. Berê ku yek dimir digirian.

**Zeyd:** (Destê xwe hiltîne û daftîne)

- Ev şerê şoreşê ye. Dem fitilandiye. Koletî totlanî hev dibe. Jiyan hin bi hin bi rûmet di-be.

**Murat:** (Serê wî di ber de bi dengekî hêdî)

- Em wek bekçiye ne, bê namûs in.

**Zeyd:** (Dîq li Mu-rat nêrî)

- Mirina nav nivînan jî bênamûsî ye. Ji bo namûsê têkoşîn lazim e.

**Murat:** (Yeqîniya wî lê hat û destê xwe avêt ser milê zeyd)

- Rast e. Di wê riye de em bi hev re ne. Kî çû, kî ma. Hemû tiş ji bo aza-diyê.

**Zeyd:** Em ji iro pê ve zarokên şoreşê ne.

(Li ber hêt herdu zarok destê wan li ser milê hev. rabûn ser xwe. Gav bi gav daketin bi jêr ve.)

Medenî Ayhan

**Mitterand hat û...***Destpêk rûpel 1*

Roja 14 ê Nisanê serokê Komara Fransayê F. Mitterand hate Tirkîyê. Hatina Mitterand ji bo Tirkîyê gelek giring bû. Mitterand di demeke wisa de hat ku Tirkîye di nav tenhayiyeke mezin de bû.

Hêzên dewletê di Newrozê de bi dehan Kurdên sivîl kuşibûn. Li ser vê hovîtiyê gelek hikûmet û dezgehê Ewrûpî dewleta Tirk protesto kirin. Hikûmeta Tirk ji ber kîrinê xwe yên li Kurdistanê di dînayê de rûreş bibû. Ji ber vê yekê jî dewlet pîr rûmet dida hatina Mitterand.

Rojnameyê Tirk û rîvebirêne dewletê dixwestin ku Mitterand wek hogir û piştgirê xwe bidin nîşan. Dixwestin ku Mitterand li hemberî têkoşîna rizgariya netewiya Kurd û PKK ê raweste, an jî piştgiriya zordestiya wan bîke. Lî çawa dixwestin wisa çenebû.

Mitterand dixwest şertênu Tirkîye tê de ye binirxîne û jî fêde bigire. Mitterand dixwest ku Fransa bêhtir bikeve bazara Tirkîyê, di aboriya Tir-

kiyê de cihê xwe xwirttir bike, ji ber vê yekê jî bi Tirkîyê re peymanênu nuh yên aborî û ticarî imze bike. Belê her du alîjî dixwestin ku ji hev fêde bigirin. Mitterand bi timî jî nebe gihişte armanca xwe, lê Tirkîye disa biserneket, nekarî armanca xwe bicih bîne.

Ji lewre Mitterand di civîna xwe ya çapemeniyê de digot ku: "Ez dîjiminê mafêne gele Kurd nînim; ez piştgiriya Kurdên bindest û perçiqf dîkim. Gelê Kurd terorist nîne, PKK partiyekê siyasi ye, lê metodê terorê bikar tîne. Dewleta Tirk divê ku mafêne Kurdan ên demokratik û neteweyî yên kîmanî bide".

Ev gotinê Mitterand li gor xwestina xwe şirove dikirin û pêşkêşê raya giştî dikirin. Piştî ku Mitterand çû, rojnameyê Tirkîyê nekêfxweşîya xwe hêdî hêdî diyar kîrin, lê ne bi eşkere û vekirî. Rojnameyê Tirkîyê wiha manşet avêtin: "Mêhvan bi vî awayî nayê qebûl kîrin. İstenbol hat kîlît kîrin. İstenbol ji ruyê Mitterand felç bû. Mêhvanî bi vî awayî nabe û hwd." Belê Tirkîye tiştên ku hêvî dikir nedît.

**Gelê Kurd xwedî***Destpêk rûpel 1*

Sond xwarine ku koka PKK ve mirînin û giş pirsên bihayî û enfasyonê, bêkarî û avakirinê hatine ji bîra kîrin, pêşniyara partiyek Kurd, ne dîtina kesekî û du kesan belê ya gişan e û bi şewra giş dezgah û sazendeyen dewletê ye.

"Partiyek Kurd" yanî ci, mana wê çiye, em divê li vê pirsê çawa binerin û helwestê welatparêzî gerek çawa be?

Partiya deshelaşdarê zordar pêşneyar dikin, rojnamevanê Hürriyet û Sabahê jê re qelemşorîyê dîkin; gelo ci rengê partiyen e? Ev partî partiya kî ye û wê kî temsîl bike?

Partî avahiyên ideolojîkî, rîexistînî û siyasi ne. Xwedîyê rîbabz û destûra xwe ne û berî her tişti wek bersivâ hewcedariyeke civakî derikevin meydana xe-

batê. Di nav xebatê de ya xwirtibin û dibin malê gel û yan jî diçilmisin, diqijilin û piştî demekê dikevin kortalâ bîrbûvînê.

Partiya ku dewlet çedike çima çedike û ji ber kîjan hewcedariyan çedike? Ev pirs gerek bê pirsin.

Ev partî ne partiya gelê Kurd belê partiya Yılmaz, partiya İnonu, partiya Komîteya Ewlakariyê MGK û Şerî Taybetî ye. Hewcedariya van bi "partiyek Kurd" heye

Partiyen gelê Kurd hene, partiyek nûh lazime yan na ew kar û şixulê gelê Kurd e. Heger hikûmet û deshelaşdarê dewletê rast û durust in û dixawzin ji bo pirşirêka gelê Kurd çareyeke demokratik û siyasi bibînin li pêşîye her tişti divê jî irâdeya gelê Kurd re humret û rîzdariyê bikin.

navneteweyî piştgirtina vê bê kîrin û êrîşen dewleta Tirk bêne sekinandin.

Piştgirtiya rojiya birçibûnê yên maddî û manewî ji aliye welatparêz û biyaniyan ve tê kîrin. Û di rojnameya Swed a mezin Svenska Dagbladet de hate weşandin.

Welatparêzen di birçibûnê de dengê xwe wiha bilind dikin "İro gelê me li Kurdistanê tê qetikirin, rejîma dewleta Tirk bi temamî barbariya xwe êrîşê dibe ser gelê me. Ji Hitler xerabtir bûye, li gundan insanan bi saxî davêjin nav agir. Li hemberî vê wehsetê kesê ku bêje ez welatparêz im, ez demokrat im û ez pêşverû me pêwîst e bê deng nemîne. İro ne roja sekne ye. Û li vêderê ci ji destê me were emê bîkin, em gelê xwe yê welat bi tenê nahelin. A dawî, heta Serxwebûna Kurdistanê têkoşîna me nasekine. Bi silavîn welatparêzî.

2- Em dixwazin komîteyek ji parlementerê Swedî qetîlam û wehseta li Kurdistanê çedibe, herin di cih de bibînin.

3- Alîkariya leşkerî û aborî ji Tirkîyê re bê sekinandin. Tûrist bira neçin Tirkîyê.

4- Em garantî û çavderiya (gözleme) navneteweyî dixwazin ji bo çekêni ji Tirkîye re têne frotin li Kurdistanê neyên bi karanîn.

5- İsal gelê Kurd wê di nav xwe de ji bo qedera xwe û pêşîya xwe hilbijartinekê çêke. Em dixwazin bi alîkî

**Rojiya birçibûnê li Swêd***Destpêk rûpel 1*

Em dixwazin qerara gelê Kurd ji bo qedera xwe bi humret (saygi) bê dîstin û têkoşîna Serxwebûna me bira neyê rawestandin, alîkariya bi her alî ji dewleta Tirk re bila bê sekinandin.

2- Em dixwazin komîteyek ji parlementerê Swedî qetîlam û wehseta li Kurdistanê çedibe, herin di cih de bibînin.

3- Alîkariya leşkerî û aborî ji Tirkîyê re bê sekinandin. Tûrist bira neçin Tirkîyê.

4- Em garantî û çavderiya (gözleme) navneteweyî dixwazin ji bo çekêni ji Tirkîye re têne frotin li Kurdistanê neyên bi karanîn.

5- İsal gelê Kurd wê di nav xwe de ji bo qedera xwe û pêşîya xwe hilbijartinekê çêke. Em dixwazin bi alîkî

**İsmet Sezgin vala zivirî***Destpêk rûpel 1*

Dewleta Tirk baş dizane ku hêza PKK û ne li derveyê welat, lê li nav welêt bixwe ye. Bargehê (kamp) gerilayê ARGK (Artêşa Rizgarîya Gelê Kurdistan) û li ser axa Kurdistanê nin. Ordiya Tirk vê rastiyê baş dizane ku her roj bi balafirê xwe êrîş dibin ser kampan û bi tonan bombe dibarîn. Lî nikarin tu zirar bidin gerilayê. Ji ber ku ser vê rastiyê bigirin û neçaretiya xwe veşerîn, bala raya giştî dikişîn ser Gelyê Bekaye.

Belê Suriye mumkun e ku hin tawîz bide dewleta Tirkîyê. Ji ber ku aboriya Suriyê gelek qels bûye, Suriye dixwaze ku bi dewletê Ewrûpî û Emerikayê re têkiliyê germ deyne. Tewrê hikûmeta Suriyê ya li hemberî Dev-Sol û hin rîexistinê din vê rastiyê diyar dike. Lî Suriye li

hemberî têkoşîna rizgariya netewaya Kurd û li hemberî PKK ê nikare dijmintî bike û li gor xwestekêne Tirkîyê biliye (hereket bike). Lewre gelê kurd û li Kurdistana Suriyeyê ji sedî heşte aligirê PKK û ye. Sedemeke din jî pirşirêk û gelşen di navbera Tirkîyê û Suriyeyê de ne. Hevberî û dijîtiyek xwirt di navbera Tirkîyê û Suriyeyê de heye. Ev jî hewqas bi hêsan û zû bi zû ji holê ranabe.

Dewleta Tirk lê digere ku çarmedorê PKK û bigre û têkoşîna rizgariya netewaya Kurdistana bifetisine. Lî ev keftûleftên Tirkîyê bê feyde nin. Lewre dewletê cînar yên Tirkîyê, qet jê bawer nînin. Dewleta Tirk dijiminê gelên cînarên xwe ye. PKK dostînî û biratiya gelan di-parêze. Gelên cînarên Kurd vê bas dizanin.

İsmet Sezgin belkî bi hêviyek mezin diçe Suriyeyê, lê wisa dixwiyê ku wê bi deske tevala bizivire.

**Hovîti û dûrûtiya dewletê***Destpêk rûpel 1*

Ên ku li hemberî wan derdikevin dikujin û dibêjin me terorist kuşt. Rojnameyê Tirk jî li gor direktifên dewletê dinivisîn û dibêjin terorist hatin kuştin. Hêzên dewletê li Kerboranê roja 27 ê Adarê êrîş dibin ser malek, xwedîyê malê bi pîrek û zarokên wî ve dikujin. Pênc kesen mîhvan jî bi wan re têne kuştin. Dîsa li navçeya Ruhayê êrîş dibin ser malek, sê zarakan bi dê û bavê wan ve dikujin.

Di belavokê de wiha tê gotin: "Dewleta Tirk ji aliye ve li Kurdistanê vê hovîtiyê dike, ji aliye din ve jî dixwaze ku dînayê bixapîne. Caran ji ilan dike û dibêje ku "tu kes nikare min bide rawestandin", ji dînayê remeydan dixwîne. Dewleta Tirk zêde guhê xwe neda tepkiyê Ewrûpiyan, ji lewre di tepkiyê xwe de ciddî nînin. Dewleta Tirk, li Ewrûpayê di nav Tirkan de bangêsiya (propaganda) nijadperestiyê û dijmintiya gelê Kurd dike. Ji bo armancê xwe yên nijadperest meşan saz dike û ji aliye ve jî bi sextekarî qala biratiyê dike".

Di Newrozê de mirovîn ku bi gullan û di bin panzeran de hatin kuştin ev in:

**Şirnex (Şırnak):** ...Hatrice (5), Zeynep Uysal (an jî Yılmaz 45), Emine Acar (16), Halil Baysal (32), Şeyhîmus Kabul (33), Halil Değer (27), Nebahat Kakuç (17), Hediye Sağıç (67), Ramazan Bayar (80), Nezir Sezek (24), Belkîs Yumak (18), Hasan Ozden (40), Abdullatif Sidar (35), Bülent Zeyrek (20), Birsen Özcan (19), Omer Dayan (55), Hacer Şen (49), Hasan Çavlak, Methi Güngen (9), Fakiye Yılmaz, Nahîye Yılmaz, Bilal Zeyrek (15), Halil Beykan (23), M. Nezir... (18), Bîşenek Anîk (16), Emin Tetik (15), Abdullah Fırsat, Safiye Kalay, Abdullah Saran, Hezar Özen, Zeynep Ören, Birsen Yaka.

**Nisêbin (Nusaybin):** Halil Bebek (12), Halil Akkuş, Hüseyîn Bilek Abdulla Ateşçi (52), Semire Acar, Kadri Dirin, Hacı Ahmet Kaya (61), Melle Ahmet Kaya (31), Mahmut Çiftçi, Abdulbaki Gündüz (27), M. Şerif Akkuş (29), Hikmet Aslan (16), Osman Duman (52), İbrahim Ergün, Aliye Er (45), Hacı Abdullah Avşın (52), Hediye Altun.

**Cizîra Botan (Cizre):** Lokman Erzen (18), Yusuf Ergin (25), Ali Bozkurt, Haci Erten, Ramazan Goziki, Hüseyin Ertepe (30), Hüseyin Sönmez (14), Nihat Celasun (17), Lokman Ercan, Mehmet Evren (12), Gerdi Avkara.

**Wan (Van):** Kesin Bayram (13), ...Arvaç.

**Gever (Yüksekova):** Emin Korkmaz (32), Ahmet Balcı, Ali Orbay, Fatma Kaçmaz (14).

**Sêrt (Siirt):** Şefika Yiğitkin (40), Medeni Tunç (15).

**Adana:** Necmettin Ekinci, Ramazan Kahraman.

**ROJEVA WELÊT****Dewlet destêne xwe dipelîne***Destpêk rûpel 1*

di mekine û kamerên wênekêş û televizyonan de bûn belge û wesiye.

Dewlet riswa bûye, hikûmet bûye dizê şekalan û bi giştî cimexwîşî û pêşîtengiyeke mezin ji siyasiyê dewleta paše û generalan re çêbûye.

Kî terorist e, terorizim ci ye û ci nav dikare li şerê nav dewletê û gelê Kurd bê kîrin tev iro piştî bûyerên Newroza îsal, ji awira raya cihanî ve zelaltî bûne.

Dewlet hew dikare mîna berê hesasiyeta raya demokratik beraber terorizmê biçewsîne û terorizma xwe veşere.

Dewleta kurduj û kurdqelê, êdî pê xweş be, ne xweş be, bi dilê xwe yan bê dilê xwe dê mecbûr be bi hesabtir û konetir lingên xwe bavêje. Em ne di zemanê Kuyucu Murad Paşa de ne û ne jî di yê Nüredin û Alpdoğan Paşa dene. "Mantiqê Dersimî" tîrba xwedî û cêbecêkerên xwe dikole.

Dewletê cihanî û xwedî gotin rexneyên xwe li Tirkîye dîrîn û di sinorekî ne temam û kêm jî de be, mafê Kurdan dikin xalek jî yên minaşe û têkiliyên xwe.

Herwiha rîexistin û dezgahêni mirovez, navê ku dewleta Tirk li şervanê Kurdan dikin û tarîfa ew ji bo terorizmê tînîn qebûl nakin û ne li gora progegendê û informasyonê ku dewlet dide, belê li gora pîvan û mîzânîn bêterefît li pîrsa Kurdan dînerin.

Çerxa zemîn li xêra Kurdan û li şerê dewletê digere. Dewlet kîlî bi kîlî dikeve qurçık û qoziyê, ketîye bin gumanan û şikê. Wê ci bike, ci riye bigre, hewar û gaziya xwe bighîne kê.

Almanya ji dest çû, Awusturya û dewletêne cîran ji dest çûne, ceheşen gundan tîst nekirin, şêx û begên welêt çu pirestiya wan nemaye û ci hunera Berzanî jî hê xwiya nake.

Di nav vê pisikolojiyê, şawşaw û çenddiliyê de dewlet li hundir û li dîrve destêne xwe dipelîne. Li dost û hevalênu û navdigere û ji êzîngê xwe nayê xwar.

Kohî çû Mitterand hat... Serdana Mitterand jî kela dilê dewletê neşkînand û birînê dewletê derman nekirin. Ev pîjin tê kîrin.

Ev demek e dewlet li rewşenbîrên Kurd digere, gundiyan Kurd, bâjariyên Kurd karker û gundiyan Kurd, ji destê dewletê çûne. Derkeyîn dîrve û hin liben rewşenbîriya col û şexsiyetqels mane... Ev qoz û hêviya dawî ye.

Niha gava em vê nîvisê dinivisîn û Ismet Sezgin hê ji serdana Suriyê venegeriyaye û bîyaran hatine girtin çîne ne xwiyanin.

Belê tiştekî xwiya û çiksayı heye. Ew jî ev e: Gelê Kurd mafêne xwe dixwaze, demokrasî û azadiyê dixwaze. Rê û metodêne girtina heq û hiqûqê xwe naskirine. Koletî û bindestîyê qebûl nake û cu carî dê serî daneyne.

Ji xwendegehêneşîran ber bi Enstituya Kurdî ve di 18 ê Nîsanê 1992 an de li İstenbolê Enstituya Kurdî vedibe. Ev rîexistin organizasyon, di wate û naveroka xwe de, hemdem û nûjen e. Ev organizasyon, rîexistineke çandî û neteweyî ya. Kurdan e. Ev bûyer di jiyana civak û neteweya Kurd de gehîneke (merhale) nuh e. Nasnameya (huviyet) kurdî, ji nuh ve cêdibe. Bîr û baweriya êlperestî dişkê, li şûna wê, ramaneke nûjen û neteweyî bi cih dibe.

Di vê nîvîsara xwe de, divêm ku ez li ser rewşa jîna civaka Kurd a rîexistinî rawwestim. Enstituya Kurdî di wateya (mane) xwe de çi ye û çi tîne zîmîn? Dixwazim ku ez, bi kin bersîva vê pîrsê bîdim.

Di dawiya sedsala 19 û destpêka sedsala 20 an de, konevaniya (siyaset) împaratoriya Osmani ya di derheqê Kurdistanê de, mîhandin û helandina Kurdan bû. Padishâhî Osmanî di wê pêvajokê de, dixwestin ku Kurdan wek şûrê Osmanî bikar bînin. Ev dilhemîde duwemîn, ji bo bicihanîna vê mebest û armancê û ji bo jimara Tîrkan li Rumeli û Anedoliyê zêdetir û xwirttir bike û Kurdan ji di nav Osmaniyan de bîhelîne û serekeşîren Kurdan bi timî bêxe bin qontrola xwe. "Alayê Hemidiyê" (1890) saz kir.

Pîştî sazkirina alayê hemidiyê Evdilhemid, ji bo ku axayê Kurdan baş bi xwe ve girê bide ji bo zarokên wana, li İstenbolê xwendegeheke eşîretê (1892) vekir. Mirov nikare bîbêje ku ev xwendegeh (mektep) li gor daxwazêne padışah meşîyan. Ji lewre xwendegeh di dawiya 1906 an de hat girtin. Xorten Kurd ên ku di xwendegehê de gihiştin, li hemberî rejîma Osmani cihen xwe girtin. Pirraniya wan ji, bûn hevalbendê partiya İttihat û Teraqî.

Gelo rîexistina pêsemîn a çandî an ji siyasi di kîjan mîjuyê de ava bûye? Damezirenen wê kî nin? Armanca damezirandina wan

# Ji xwendegehêneşîran ber bi Enstituya Kurdî ve Jiyana Kurdan tê guhertin



## ENSTITUYA KURDÎ

rîexistinan ci nin?

Bersîva van pîrsan ku ji bo dîroka civak û neteweya Kurd gelek gîring e, divê bê dayin. Kurd, dîroka xwe hîna bi agahdariyên kronolojikî nenivîsîne. Divê Enstituya Kurdî bi bîr û mantiqeke rast bersîva vê hewcedariyê neke rîexistinî. Di nav damezirenen organîzasyonê de

û jîna neteweya kurdî bi rastîni pêwîst e ku mirov ji cîhekî dest pêbîke.

Hingî ku em dizanîn, rîexistina kurdî ya pêşemîn "Azmî Qawî Cemiyeti" ye, ku di bin rîberiya Fikri Efendiyê Amedî de (1900) hatîye saz kirin. Bi vê rîexistinê ramana kurdewerî cara yekemîn digihêje gehî-

tin, dûre "Kurd Teawûn ve Teraqî Cemiyeti" tê ava kirin. Damezirenen vê komelê Emin Eli Bedirxanî, Mihemed Sefig paşa, Seyid Evdilqadirê kurê Ubeydullah Nehîrî û Muşir Damat Zulkuf paşa nin. Pirraniya endamên komelê ji

malbat û êlén Şemzinan, Baban û Bedirxaniyan bûn. Kurd Teawûn ve Teraqî Cemiyeti, pişta xwe dabû eşitîren Kurd. Ronakbîren Kurd, ên li İstenbolê, tev endamên vê komelê bûn. Têkîlî û hevbendiyen vê komelê bi Jon Tîrkan re hebû.

Armanca Kurd Teawûn û Teraqî Cemiyeti ev bû: Li Kurdistanê vekirina dibistan, pejirandina zimanê Kur-

dan, Mîladeke dinê ye, bira ji gelê me re û ji me gişan re pîroz be.

"Ez ditirsim ji îsal pêde bengî bim," digot hozanekî Kurd, yekî ji digot: "Dilê min doxtor, dilê min bi rojê re li Qersê ye, dilê min her êvar, her êvar li Wanê ye."

Enstituya Kurdî, ji bo zimanê me, ji bo dîroka me, ji bo çanda me, li ber çavên min mîna kela Diyarbekirê, mîna kela Bazîdê û Mîrdînê ye. Ji vê rojê pêve wê barekî giran bikeve ser milê şîxukar û dewlemeden Kurdîn welatparêz. Bi alîkariya wan wê

enstiti bibe xweye milkekî, ku navnîşana wê zû bi zû neyê gherandin. Lî belê endamên enstitiyê, bê kîmasî, wê herne civat û konferansên Kurdolojîyê û bîn. Ji bo enstiti bikaribe kutupxaneke hîja bide rîzandinê, gazî Kurdnas û nîvîskarîn mezin bîke, wan bîne vê derê, van xebatîn enstitiyê gîşk bê şik li ser milê pera û aboriyê ye.

Kurd gere ji iro û pêve bifikiyin, yê bê zar û bê zuriyet, berî mirina xwe xan û manê xwe pêşkêsi enstitiyê bikin. Hinek karker û dewlemeden her sal zîr û zîv, xalîce bikirin û pêşkêsi ens-

dî bi şîweyeke fermî, temsîlîkirina Kurdan di meclisa Osmani de, pêşvebirina aborî û sitendina hin mafîn din. Ev komele bi navê Kurd Teawûn û Teraqî rojnameyek derdixist. Serokatiya Kurd Teawûn ve Teraqî Cemiyeti Seyid Evdilqadir dîkir. Cîgirê wî jî Muşir Ehmed paşa bû.

Ev komele ji bo hîsankirin û hînbûna zimanê kurdî û ji bo amadekirina rîzman (gramer) ek û ferhengokek bermeyek (programek) fireh daniye ber xwe û ketiye nav kar û barêñ giran. Kurd Teawûn û Teraqî Cemiyeti, bi karêni siyasi ve jî mijul dibû. Komele ji bo hin mafîn Kurdan û demokratik û neteweyî da sila 1909 an de, muhtirayek dâye hîkûmeta Osmaniyan. Ev muhtira ji, di rojnama Tanin (23. Cotmeh 1909) de hatiye weşandin.

Pirraniya rîvebir û damezirenen komelê Kurd ên vê demê, kesen burokrat û aristokrat in. Ev şexsiyeten han ên li pêş, di hemdemî de li dezgehêneşîr fermî (resmi) yê dewletê dixebitîyan. Ruhê kurdewerî di van kesan de xwirt e, lê xwedi bîr û baweriye serbixwe nîn bûn, nedixwestin ku ji Osmaniyan veqetin û dewleteke serbixwe damezirînin.

Organîzasyonen ku di dawiya sedsala 19 an û destpêka sedsala 20 an de hatine damezirandin, di jiyana civaka Kurd de gelek şop hîstîne, lê divê hin şopîn ne kîrhafî ji jiyana civaka Kurd bê ne derxistin. Ev erk û wezîfe ji, yê rewşenbîren Kurd e. Ji ber vê yekê û di vê watayê de Enstituya Kurdî ji bo civaka Kurd û ronakbîren Kurd fersendeke gelek mezin e.

Ew bîr û bawerî û ramana ku Enstituya Kurdî ava dike, ji bo pêşveçûna civaka Kurd wek rona-hîyekî ye. Ev raman (fikir) di jîna neteweya Kurd de xwedî rûmet, giranî û girîngiyek e. Bîr û ramana kurdewerî ya nûjen (modern) wê bi avahîyen neteweyî wek Enstituya Kurdî bibe hîzeke xwirt û mezin. Bila temen û jiyana Enstituya Kurdî dirêj be.

*Ismail Göldüş*

## Enstituya Kurdî vebû

Çend meh in, hevalê hîja ji bo amadekirina enstitiyê dixebeitin. Ji serî heta niha Navenda Çanda Mezopotamya Jîrîn xwedîyê male bû. Zehf alîkarî da sazgîren komîteyê Mamoste û sosyologe mezin Ismail Beşikçi, Musa Anter, Abdurahman Durre, Faqe Huseyn Sağnîç, İbrahim Gürbüz, Talat İnanç, Yaşar Kaya, D. Cemîd Bender,

Süleyman İnanoğlu'ne.

Dîroka gelê me, iro rojeke ronahî dît. Helbestvanekî Kurd wiha dibêjê: "Hêdî pîrr hêdî, rehta-na rôjê, cih bi cih cemekî dîgrî û dikene. Li ezmana tariyekê xebîs, li erdê avekê cawramîs" iro dilê min bix we zehf geş e. Mîna kîlîkê Elegezê, mîna cemê Mûradê, mîna berfa serê Agîrî, mîna gola Wanê, ez nikarim vê şâhiyê, vê xewnê bi tu awayî binivîsinim. Iro ji bo çanda Kur-

tutiyê bikin. Enstiti dewlemeden nebe nikare tu karî bike. Van hevalê sazkar hîmî danîn, ji iro pêve, herkes kevirekî daneyne ser vî hîmî, tiştek nabe mal û hal. Ezê yek tiştekî bi tenê ji hevalan re bîbîjîm, ewê zehf bikerrîbin (bi ber xwe kevin). Sekreterê "Kurt Tealî cemiyeti" yê Prof. Şukrî Baban mir, tu warisê wî tunebûn. Sê çar heb xan, koşkekê mezin, gişt da Darulecezê. Gerek ev ji me re bibe dersekî mezin.

*Yaşar Kaya*

**we lat**

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedi (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê: Zübeyir Çakır
- Berpîrsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpîrsiyare Nîvîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Çağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60-511 66 02
- Fax: 512 12 87 • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ